# MARISTAN

## ŞANO

Salih Bozan



Maristan - Şano
Salih Bozan

## Ravayek

Peyva "Maristan" peyveke farisî ye, lê ji mêj ve ketiye zimanê kurdî. Di gotinên gelîrî de tê gotin: "Bira merî li Maristan be ne li Goristanan be".

Di Maristaneke welatekî bi navê Sawêristan de sê kesên taybet hebûn. Berî ku xwedî wan têxin Maristanê, ew mamosteyê zanîngehê bûn. Yek bi navê Dr. Nîgarkêş bû. Wî dersê "Dîroka Olan" dida şagirtan, ê din Dr. Mizawir bû, wî dersê "Dîroka felsefeyê" dida û yê sêyem bi navê Dr. Mendîn bû, wî jî dersê "Dîroka Civata Mirovan" dida. Ev hersê mamoste di zanîngehê de bi navûdeng bûn. Ji pirtûkxaneyan dernediketin. Li ser maseya xarinê pirtûk di destê wan de bûn, di xaniyê xewê de û yek caran ku bi rê ve diçûn dîsa pirtûk di destê wan de bûn. Şagirtên wan bi henekî digotin van mamosteyan sewdanê xwe kirê dane, ango dîn bûne. Bi vê sedemê ji zanîngehê hatin qewtandin. Paşê xwediyên wan ji gotinên wan nefret kirin, ji ber wan ve di civakê de fedî dikirin. Lewra mecbûr bûn wan têxin vê MARISTANê.

Di Maristanê de jî tim bi hevdu re bûn. Carekê Dr. Nîgarkêş bi hevalê xwe re got: Hun dizanin gava Yezdan ji bêxûtiya xwe derket  ji bo xwe nas bike, ev gerdûna bi tevahî tinebû. Gewherek çêkir. Bi nêrîneke

samdarî li Gewherê nihêrî, Gewher bû av. Hîcar Yezdan li avê nihêrî, av keliya, kef bi ser ket, kelebox jê rabû. Ji keleboxê ezman çêkir, bê istûn jor de rakir, ji kefê jî zemîn çêkir û daxiste jêr. Yezdan ji zemîn re got: Ezê ji te xelkekî çêbikim dê hinek ji wan wek ez dixwazim bikin û hinek jî ne wek ez daxwazim wê bikin. Dr. Nîgarkêş got: Lê paşê nakokî di navbera Yezdan û aferîdeyên wî de derket. Dr. Nêgarkêş got: Hevalno kes me ji vir dernaxê. Jiyana me ta mirinê dê li vir berdewam bibe. Ango cihana me ev Maristana ye. Hun çi dibêjin ku em vê çîrokê ji xwe re dubare bikin. Bira şêniyê Maristanê ji vê rewşa muzûrî derkevin û hinekî bextewr bibin.

## Lîstikvanêm Vê Şanoyê

Dr. Nîgarkêş: Rola Yezdan dilîze.
Dr. Mizawir: Rola Iblîs dilîze.
Dr.Mendîn: Rola Adem dilîze.
Şandiyar: Rola firêşte Cebrahîl dilîze.
Heso: Rola Mîkahîl dilîze.
Xişmo: Rola firêşte Ezrahîl dilîze.
Razîxan: Rola firîşte Ridwan dilîze.
Jiyan: Rola Hewwa dilîze.
Tawûs
Şahmar.
Û hinek firîşteyên din.

## Beşa Yekem

(Perde vedive, Dr. Nîgarkêş li ser textekî rûniştiye, piştî karê şeş rojan ê afirandinê vês dikîye. Çend kesên din li dor wî re weke xizmetkaran dizivirine, xwe jê re xardikin, û pesnê wî ber xwe de didin).

Nîgarkêş: Min hîro hun civandin ji bo ji we re bibêjim, ez dikim ji axê mirovekî çêbikim ta li ser Zemîn bibe xelîfeyê min, ji bo şûna min serweriya Zemîn bike, navê wî dê Mendîn be.

Girûpa Xizmetkaran (Dikevin bêdengiyekê, li hevdu dinihêrin û tişetekî nabêjin)...

Nîgarkêş: Ev çi bêdengiya giran e xwe avête ser we? Wekî ku hun ne razî ne.

Girûpa Xizmetkaran: Nîgarkêşê Mezin..! Ji dema ku te em afirandin, em li hember te serê xwe dadixin, bi navê te şa dibin, bi dilûcan perestiyê ji te re dikin, ev jî serokê me ye (Nîşanî Mizawer dikin) ti cih li Esmên û li ser Zemîn nehîştin lê sicde ji te re nekir. Ma tu ji perestiya ku em ji te re dikin ne raziyî taku tu hewceyê aferîdeyekî din î?

Nîgarkêş: Ev aferîdeyê ku ez dikim baferînim, ew jî dê ji min re perestiyê bike. Hun li vê derê li esmên ji min re sicdeyê dikin, ew jî dê li ser zemîn.

Girûpa Xizmetkaran: Nîgarkêşê Mezin..! Lê ev aferîdeyê ku tu dikî baferînî, ew ê ne bes ji te re perestiyê bike, belam dê xerabiyê jî li ser zemîn bike, xûnê birijîne. Ma tu razî ku di nav aferîdeyên te de kesek destê xwe di şer ke? weke em dizanin tu xêra gelemperî.

Nîgarkêş: Ez di çavên we de hesûdiyê dibînim. Min hun ji ronahiyê çêkirin, û dikim wî ji axê çêbikim. De ev çi zikreşiye di dilê we de dikele?

Girûpa Xizmetkaran: Nîgarkêşê Mezin, em xizmetkarên te ne, tu jî rewşa aferêdeyên xwe dizanî, lê tiştê ku em dixwazin ji te re bibêjin, dê zemîn gazinên vî mirovî bike, ji berku ew ê cengan lidarxîne, ziyanê bigihîne lawir û rewzan, bi ro û şev tu yê hawara wan bibihîsî.

Nîgarkêş: Bes e ev gengeşeya we. Wexta min hun afirandin, min ji we re got, ez naxwazim aferîdeyên min bi min re bidin û bistînin, karê we hun guh bidin min, ji min re sicdeyê bikin û fermanê min bi cih bînin. (Li Şandiyar dinihêre) ne min bi te re got here hinek ax ji zimîn bîne. Çima te fermanê min bicih nanî?

Şandiyar: Nîgarkêşê Mezin..! Weke te xwest, ez çûm ser zemîn, û min mistek ax jê xwest. Lê zemîn bi navê te sond xwar, ji min tika kir ku ew naxwaze tiştek ji wî di pêşerojê de bibe para êgir. Min nikanibû ser sonda bi navê te re xwe çekira, loma ez destvala vegeriyam.

Nîgarkêş: Min dizanibû tuyê destvala vegerî, ji bir ku dilê te tenik e, gava navê min li ber te tê gotin tu hemû tiştî didî aliyekî û dadikevî sicdeyê. (Li Heso dinihêre) De tu here mistek ax bîne. (Heso di tariya Şano de winda dibe û dîsa xuya dibe)

Nîgargêş: Ha te hanî?

Heso: Nîgarkêşê Mezin..! Weke ku zemîn bi Şandiyr re got bi min re jî got û tu dizanî ez nikarim sondê bi navê te bişikînim.

Nîgarkêş: Tu jî li hember navê min ji tirsa re xwe şaş dikî. (Serî xwe dizivirîne û li Xişmo dinihêre) Xişmo tu here. (Xişmo jî di tariya Şano de winda dibe, û dîsa vedigere).

Xişmo: Nîgarkêşê Mezin..! ez ji te lêborînê dixwazim. Gava zemîn bi navê te sond xwar, ez ketim şaneke kûr. Min ji xwe pirsî: Gelo di navbera navê te û fermanê te de gerek ez çi bikim? Piştî

ez kûr fikirîm, min ji zemîn re got: Law zemîno..min jî bi navê Nîgarkêş sond xwariye ku ez ê ti carî fermanê wî red nekim. Min ji herçar goşeyên wî, ji ser rûyê wî, ji celb û axa wî ya sor û ya reş kom kir û va ye min hanî.

Nîgarkêş: Eferim Xişmo... tu fermanên min bê gengeşe bicihtînî, loma min tu kirî şahê mirinê.

Xişmo: Nîgarkêşê Mezin...! ez ti carî ji bin fermanê te dernakevim.

Nîgarkêş: Xişmo.. ez dixwazim tu vê axê bi ava tal, şêrîn û şor bistirêyî, bihêle bimeye. Bira dûndeyên vî aferîdeyê min bi reng û sinciyên cuda bin.

Girûpa Xizmetkaran: (Bi hev re dibêjin Nîgarkêş em tev bi reng û babetekî çêkirin, heta piraniya me bê navin, em nikanin xwe ji hevdu derxînin.)

Nîgarkêş: (Bi Girupa Xizmetkan re daxife) We çi pistepist e, ez naxwazim kesek gotinên xwe di ber gotinên min re derxîne. (dîsa li Xişmo dinihêre) Xişmoyê min .. weke birûskê here ser zemîn, ji min re mistek axa sipî ji hundirî dilê wî bîne, ez dikim di vê gila Mendîn de nêmikê dilyarê xwe biçînim. (Xişmo bi lez derdikeve)

Girûpa Xizmetkaran: Nîgarkêşê Mezin...! dilyarê te kî ye? Ma tu dikî aferîdeyekî din jî li kêleka Mendîn baferînî?

Nîgarkêş: Na..na..Dilyarê min, ew Rêzanê min ê herî dawiyê ye ku ezê ji dûndeyên Mendîn hilbijêrim. Min ji bo wî ev gerdûn û hemû tiştên tê de aferand.

Girûpa Xizmetkaran: Heta em jî..?

Nîgarkêş: Heta hun jî. (Xişmo dîsa dikeve hundir)

Xişmo: Nîgarkêşê Mezin..! Ji te re mista axa sipî.

Nîgarkêş: De tevî gila Mendîn bike û bi ava Tesnîmê bistirê. Jêgere ta dibe durryeke sipî, paşê di ava çemên Bihuştê de bike û ji min re bîne.

(Nîgarkêş ji şano derdikeve û bi wî re Şandiyar, Heso û Xişmo jî derdikevin, Girûpa Xizmetkaran bi tenê dimînin)

Xizmetkarek: Biraderno... Ma Nîgarkêş tiştekî ji me vedişêrîye?

Xizmetkarekî din: Ez matmayî me. Nîgarkêş ji me re got ku wî ev gerdûna aferand ji bo xwe tê de nas bike. Evqas dewran derbas bûn ti carî ji me re negot ku ew hewceyê kesekî din e. Ji nişkave dike Mendîn baferîne!.

Xizmetkarê sêyem: A tewre ecêb, cara yekem e Nîgarkêş ji me re dibêje ku wî cihan ji bo dilyarê xwe yê ku em hîn nasnakin ava kir.

Xizmetkarê çarem: Doza Mendîn hîn neketiye serê me, hîcar ji me re dilyarê wî Rêzan derket holê.

Xizmetkarê pêncem: Biraderno.. hun nabînin ku Nîgarkêş li hember me têye guhartin?

Xizmetkarê yekem: Tu rast dibêjî. Cara yekem e ku weha sert bi me re daxive.

Xizmetkarê duyem: Biraderno.. çiqas me zanahî wergirtiye em nikanin bizanibin çi di sewdanê Nîgarkêş de dizîviriye.

Xizmetkarê sêyem: Ew tim ji me re dibêje ku ew tenê xeybê dizane, de çima em serî xwe dêşînin? Çi dike bira bike, ew Nîgarkêş e, em jî xizmetkarê wî ne.

Xizmetkarê çarem: Ez dibêjim baştir e em vê gotûbêja xwe bi dawî  bikin, ji bo em wî zêde nexeydînin.

Xizmetkarê  pêncemîn: Gotina te ye. Ku Nîgarkêş bixeyîde em nizanin dê çi bîne serê me.

Xizmetkarê yekem: Hun dizanin ji min ve xuya dibe, ku em li ber guhartineke mizin in.

(Ji nişkave Nîgarkêş tê ser textê xwe )

Nîgarkêş: Ez dizanim hun çi li pêş min dibêjin û çi li paş min.

Girûpa Xizmetkaran (Bi hev re): Nîgarkêşê Mezin..! ma hêza me heye ku em kanibin tiştekî ji te veşêrin?

Nîgarkêş: Na..na.., hun li pey min bi hev re daxivin. Gava min hun aferandin, min ji we re got ez tenê Nîgarkêşê gerdûn û demê me û ez im ê hemû tiştî dizane.

Girûpa Xizmetkaran (Bi yek dengî): Tu rast dibêjî Nîgarkêşê Mezin.

Nîgarkêş: Li despêkê min ji we re got, ez tenê yê pirsan dipirsim û pirs ji min nabin.

Girûpa Xizmetkaran (Bi yek dengî): Belê Nîgarkêşê Mezin.

Nîgarkêş: Kî ji bin fermanê min derkeve, ew ti mehderçiyekî ji bo piştgirya xwe nabîne.

Girûpa Xizmetkaran: Haş e ku em bifikirin ji bin fermanê te derkevin.

Nîgarkêş: De bes e.., we çi di nav xwe de pitepit e.

(Girûpa Xizmetkaran ji tirsa re dilerizin, û wê çaxê Xişmo dikeve hundir)

Xişmo: Nîgarkêşê Mezin...! Min fermanê te pêkhanî

Nîgarkêş: Weke min ji te xwest te kir?

Xişmo: Belê.. û ev gila dilyarê te ye ku bû durreyeke paksipî.

(Nîgarkêş li durreyê dinihêre, durre ji sama Nîgarkêş diheje, sed hezar dilop jê dilop dibin, û bîst û çar hezar dilopên din).

Nîgarkêş (Bi Girûpa Xizmetkaran re): Hun van dilopan dibînin?

Girûpa Xizmetkaran: (Bi yek dengî): Belê.. ew dilopên gewresipî ne, me ti carî weke wan nedîtiye.

Nîgarkêş: Her dilopek ji van dilopan dê bibe Rêzanek ji Rêzanên ku ez ê bişînim nav dûndeyên Mendîn ji bo rêya min a rast raberî wan bikin û kesek ji dernekeve.

## Perde Têgirtin

## Beşa Duyem

(Şano wekî bîstanekî bi darûber e. Ew bihuşta Nîgarkêş e. Deriyekî wekî devê şkeftekê ye. Pûtê Mendîn li ber derî ye û xizmetkarê Nîgarkêş li hawirdorê ne).

Girûpa Xizmetkaran: (Bi hev re) Ev çiqas aferîdeyekî bedew e, bîçima wî gelek çeleng e, çî bejin zirav û dirêj e.

Xizmetkarê yekem: Me kesekî weha di di nav xwe de û di nav cin û pêriyan de nedîye.

Xizmetkarê duyem: Hûn dibînin ku ew ne wek meye? Bi carekê ji me cuda ye.

Mizawir (Ji nav wan derdikeve û berve pûtê Mendîn tê. Di kûnê çavan re lê dinihêre, nigê xwe li pût dixe, dengê ringîniyekê jê derdikeve. Xwe dike devê pût û di kûna wî re derdikeve) Biraderno.. Nîgarkêş ev mirova ji boşê çênekiriye, û ne ji bo em li çelengiya wî binihêrin danîye vir.

Xizmetkarê yekem: Tu çi dixwazî bibêjî?

Mizawir: Nîgarkêş ev mirova ji bo armanceke mezin aferandiye, lê em nizanin çi armance.

Xizmetkarê duyem: De çi armanc dike ji vî pûtê ku ji axê çêbûye dê derkeve?

Mizawir: Na..na.. weha sivik neramin.

Xizmetkarê sêyem: Tu serokê me yî, tu ji me zanatirî, de nêrîna xwe ya kûr ji me re şîrove bike.
Mizawir: We nebihîst, gava min nigê xwe lêxist ringîniyek jê derket?
Ggirûpa Xizmetkaran (Bi hev re): Belê.. me ew ringîniya bihîst.
Mizawir: Gava min di devê wî de nihêrî aliyê din ji min ve xuyabû.
Girûpa Xizmetkaran (Bi hev re) Êêê..
Mizawer: Ev afirîdeyekî vala ye.
Xizmetkarê sêyem: Ê.. Çi wateya vê valahiyahundirî wî ye?
Mizawir: Yanî ev aferîdeya nikare xwe li ber daxwazên xwe bigire, û li ser tiştekî jî raweste.
Xizmetkarê çaremîn: Ne ringîniya wî û ne jî valahiya wî bala min kişand, a girink çima Nîgarkêş ew li ber deriyê Bihuştê danî, ku em bi ro û şev lê rast werin?.
Mizawir: Weke ku Nîgarkêş dixwaze em bi hebûna wî re werin.
Xizmetkarê pêncemîn: Gelo eceb Nîgarkêş hîn çi tiştekî din ji me vaşartîye ?
Xizmetkarê yekem: Law de serê me bi vî Mendînî mêşînin, herku em zêde lê biramin, em ê zêdetrîn ji pêşerojê bitirsin.
Mizawir: Bi rastî ez ji pêşerojê bi tirs im.

Xizmetkarê duyem: De çi tirs dike ji vê gilê derkeve looo...
Mizawir: Biraderno..hun çi dibêjin, lê ku Nîgarkêş wî di ser me re bigire, û ji me çêtir bihesibîne?
Girûpa Xizmetkaran (Bi dengekî melûl û jihevketî): Qet nabe.
Mizawir: Çima nabe? Ma we bawer dikir ku wê rojek were dê Nîgarkêş aferîdeyekî wiha çêbike û li ber me deyne?
Xizmetkarê sêyem: Na..na.. dûr meramin. Ev mirova ji axê çêbûye, em jî ji ronahiyê ne. Çawa dê Nîgarkêş axê ser ronahiyê re bigire? Ma ronahî ne tiştekî ji Nîgarkêş bixwe ye?
Mizawir: Belê.. Tu rast dibêjî. Lê gava vê axê ser me re bigire hunê çi bikin?
Girûpa Xizmetkaran (lihev dinihêrin û piştî bêdengiyekê): Ma çi ji destê me derdikeve, emê ji tirsa xişma wî re fermanê wî bipejirînin.
Mizawir: Ev yeka dê sistema ezmên bi tevahî biguhêre.
Girûpa xizmetkaran: Mizawir me zêde metirsîne.
Mizawir Ez ji we re dibêjim ku û li hember we sond dixwim, ku di ser min re bigire, ezê li ber fermanê wî derkevim.

Xizmekarê yekem: Wa.. wa, qeyî tu dîn nebû ye. Çawa tuyê bieêribî li ber Nîgarkêş derkevî?

Mizawir: Ku min ser wî re bigire, ez ê wî bi destê xwe bifetisî nim.

## Perde Tê Girtin

## Beşa Sêyem

(Cih ê beşa yemem e. Nîgarkêş li ser Textê xwe ye, pûtgewdeyê Mendîn li pêş wî ye. Girûpa Xizmetkaran li dor Textê Nîgarkêş sekinîne. Nîgarkêş jî destekî xwe bi jor de rakiriye haniye ber çavê xwe, li ser wî destî tiştekî mîna gilokeke dûman xuya dibe).

Nîgarkêş: (Bi wê giloka dûmanê re daxive) Lo giyanê ku min ji xwe biriye, di gewdeyê Mendîn keve.

Giyan: Ew dergehekî teng e, ciyekî tarî ye, ez naxwazim ji ronahiya te dûr kevim û herim dereke tarî.(Deng ji dereke şano derdikeve).

Nîgarkêş: Tu parçeyek ji min î, çawa tu li hember min derdikevî?

Giyan: Belê.. ez parçeyek ji te me, ez azad im, ji berku ji te me. Ti serkêşî di navber min û te de nîn e, lê ev pûta ji axê ye, ez naxwazim di axa genî de dorpêç bibim û azadiya xwe wenda bikim.

Nîgarkêş: Madele tu ji min î, de wekî ez dixwazim bi lez di gewdeyê Mendîn keve.

Giyan: Despêka wî ji min ve xuya dibîye, lê ez dawiya wî nabînime. Çawa ez ê di dereke nenas kevim.

Nîgarkêş: Ez dibînim tu jî bi nexweşiya gengeşeyê ketiye.

Giyan: Ez ji te me, loma ti nexweşiyeke weha nêzike min nabe.

Nîgarkêş: Ku tu bi lez nekevîû gewdeyê Mendîn, ezê bi zorê te di gewdeyê wî kim û wê rojek were tu yê bi zorê jî jê derkevî.

Giyan: Madele tu min weha dikî bêçariyê, ez ê çavên xwe qurç bikin û di hundirî vî pûtî kevim û çi dibe bira bibe.

Nîgarkêş: Ez vê nerazmendiya te naecibînim, weke ku tu minetekê li min dikî.

Giyan: Baş e, bira weke tu dixwazî be. De li despêkê ez di kura têkevim?

Nîgarkêş: Di pozî wî re têkeve û seranser here mejiyê wî, paşê rihê xwe berde çavên wî zimanê wî û li tevahiya gewdeyê wî belav bibe. (Giloka dûmanê dikeve pozê Mendîn).

Mendîn: (Ji nişkave Mendîn dibênije, radibe ser xwe û matmayî li hawirdorê xwe dinihêre) Ez kî me?

Nîgarkêş: (Bi kêfxweşî) Tu Mendîn î.

Mendîn: Ez ji ku hat im?

Nîgarkêş: (Herdu destê xwe dilivîne) Min tu bi van destên xwe çêkirî.

Mendîn: (Bi Nîgarkê de qîq dike) Lê tu kî?

Nîgarkêş: Ez Nîgarkêşê Tenha me, tu jî rebenê min î.

Mendîn: Min fêm nekir, Nîgarkêşê Tenha kî ye?

Nîgarkêş: Ez yê ku ezman û zemîn aferand. Min gerdûna bi tevahî wekî malekê ji xwe re çêkir. Ti aferîde wekî min nîn e.

Mendîn: Lê evên li dor te re dizîvirin kî ne?

Nîgarkêş: Ev giş aferîdeyên min in, ew azepê min in. Min ew ji xwe re aferandin ji bo pesnê min bikin, berdewam ji min re dakevin sicdeyê û hemû fermanên min bicih bînin.

Mendîn: Çima gewdeyê min ne wekî gewdeyê wan e?

Nîgarkêş: Min tu ji axê aferadî û ew ji ronahiyê, lewra hun ji hev cuda ne.

Mendîn: (Li gewdeyê xwe dinihêre, dest û nigên xwe dilivîn e, û xwe diecibîne) Çiqas ez bedew im. Hêzek di hundirî min de dilipite, hema endamên gewdeyê min bi vê hêzê de girêdayî ne.

Nîgarkêş: Ji berku min tu wekî wêneya xwe aferandî.

Mendîn: Gava min li mêweyê darên hanê nihêrî (Bi destê xwe nîşanî Bihuştê dike) di hundirê min de şehwetek

keliya. Ma ev azepên te jî bi van hestan wekî min dihisin?

Nîgarkêş: Na..Tu bi hemû tiştî ji wan cudayî. Ew ne tiştekî dixwin û ne vedixwin.

Mendîn: Hîn bi çi ez ji wan cuda me?

Nîgarkêş: Min tu aferandî ji bo dozeke mezin. (Nîgarkêş ji ser textê xwe peyadibe, Mendîn bi cilên Bihuştê dixemilîn e, û bi Xizmetkarên xwe re dibêje) Mendîn li ser textekî deynin, rakin ser milê xwe û li ezmanê min bigerînin, ta hemû tiştên min çêkirine bibîne, ji bo baweriya xwe bi min kûr bike.

Girûpa Xizmetkaran: Ser serî û çavên me, em ji bo fermanên te tim amade ne. (Xizmetkar textekî tînin, Mendîn datînin ser, wî radikin ser milê xwe û weha ji şanoyê derdikevin. Nîgarkêş bi tenê xwe dimîne)

Nîgarkêş: (Bi xwe re daxive) Min gelek aferîde afirandin, lê bi Mendîn zêdetir ez bi hûnera aferandinê hest bûm. Ev aferîde wekî min bedew e. Ji ezelê ta niha ev cara yekem e ez bi nîgarkêşiya xwe kûr hest dibim. Bi rastî ev cihana hêjayê çêkirinê bû ji bo Mendîn û kurdûndeyên wî tê de bijîn. Bi çêkirina vî mirovî ez bi tenahiya xwe ya bêhempa hest bûm.

Aferîdeyên min ên din kukum in, ti carî ez negîhandim vê hestê. Heta Mizawirê ku ji wan gişkan sicdeyê ji min re dike û li hember min zelûl dibe, hema dike bihile, ez bi sicdeya wî ne wiqas kêfxweş bûm qasî ku bi gotina Mendîn, ez kî me kêfxweş bûm. Vî aferîdeyî cudahiyek di navbera min û xwe de danî. Ez li hember mirovekî li serxwebûnê dirame çavên xwe li azadiyê ne. Min ev helwesta ti carî di aferîdeyên xwe yên din de nedî. Ti carî aferîdeyên min ên din pirs ji min nekirin. Bi rastî bê Mendîn nîgarkêşiya min bê wate ye. Hîro ez bi rastî hest dibim ku Nîgarkêş im. (Xizmetkar dikevin hundir, Mendîn datînin ber Textê Nîgarkêş)

Mendîn: Nîgarkêş ê Mezintirîn...! Çiqas ezmanê te bedew e, fere ye. Ezmanek ji ezmanekî çelengtir e. Lê ro û hîv..(Serî xwe dihejîne) di ezmanê te de bi bextewrî sicdeyê ji te re dikin. Tu Nîgarkêşekî bê hempayî.

Nîgarkêş: (Bextewerî ji rûyê Nîgarkêş dilop dibe) Şalam baweriya te bi min kûr û berfireh bû?

Mendîn: Sewdanê min nagihêje tiştên ku min dîtin, heta di endîşeyên xwe de ez nikarim baferînim. Bi rastî tu hêjayî pesin û perizînêyî (Ji kêfxweşbûna re gelpikên Nîgarkêş dihejin. Devî xwe dike guhê Mendîn bi pistepist wî fêrî navên tiştan giş dike)

Nîgarkê: Hê azepno.. Mendîn derhoja min e, aferîdeyê min ê tewrî dilyar e. Ez ji we dixwazim hun jê re dakevin sicdeyê.

Girûpa Xizmkaran: (Bi matmayî li hevdu dinihêrin, çav li wan disekine, nefes diçike, lê ji ciyê xwe nalivin)...

Nîgarkêş: (Bi rûyekî tirşî li wan dinihêre) Çima hun bi dudilî sekinîne, ma we fermanê min nebihîst? Hun xwe ji Mendîn çêtir û zanatir dibînin?

Girûpa Xizmetkaran: Nîgarkêşê me..! hemû aferîdeyên ku te ta niha aferandin, te em ji wan bilindtir didî. Pîsî û nerindî ji me dernakeve. Te em ji ronahiya pakîze aferandin. Lê va Mendîn te dê pîsiyê li ser zemîn biçîne û xûnê birijîne. De çawa emê jê kujerekî re dakevin sicdeyê?

Nîgarkêş: Ha..ha.. hun xwe jê zanetir dibînin. Ku hun bi rastî pakîze ne de ev çi zikreşiyeke ji we derdikeve. Ku hun ji Mendîn zanatirin, de ji min re

navê tiştên min ta niha aerandin bibêjin.

Girûpa Xizmetkaran: (Ji nû ve li hevdu dinihêrin, li serokê xwe Mizawir dinihêrin, Mizawir jî pişta xwe daye stûneke textê Nîgarkêş, ketiye rewşeke ramangeriyê) Nîgarkêşê me, tiştên ku te em fêrî wan kirin, em dizanin. Te em fêri navên tu ji me dixwazî nekirin. De çawa em ê wan bibêjin?.

Nîgarkêş: Mendînê min tu wan navan bibêje.

Mendîn: (Navan yek bi yek dibêje û li Nîgarkêş dinihêre) Nîgarkêşê min tu zanyarê tewrî mezinî.

Nîgarkêş: We dî çawa ew dizane, ew ji we zanatire, de bê pitepit jê re dakevin sicdeyê.

Girûpa Xizmetkaran: Fermanê te li ser serê me (Giş bi hev re dadikevin sicdeyê û di kûnê çavan re li Mizawir dinihêrin).

Nîgarkêş: (Ew jî li Mizawir dinihêre û bi dilşkestî jê dipirse) Mesela te çî ye? Tu wekî kevirekî sekinîye û danaketî sicdeyê?

Mizawir: Ez ji vî aferîdeyê ku ji nişkave derket holê danakevin sicdeyê.

Nîgarkêş: Çima..? Ma tu xwe ji wî bilindtir dibînî?

Mizawir: Belê.. ez jê bilindtir im û çêtirim.

Nîgarkêş: Bes.. te jî nav nizanibûn.

Mizawir: Te hîlebazî li me kir. Te ew navana di guhê wî de jê re gotin û ti carî berê te ji me re aşkere nekirin.

Nîgarkêş: Serî xwe mezin meke, ew ji we çêtir e, ji ber ku min ew bi destê xwe çêkir, û ji giyanê xwe giyanek pife gewdeyê wî kir.

Mizawir: Dîsa ez ji wî çêtir im, te ew ji axa genî çêkir a ez ji agirê pakîze çêkirim.

Nîgarkêş: Ez ê dizane kî ji kê çêtir e ne tu.

Mizawir: Belê ez vê yekê dizanim, û gor vê yekê jî dibêjim ez ji wî mezintir im, berî wî çêbûm, berî wî min tu naskirî. Tu vê rastiyê nikanî înkar bikî. Ev rastiya min ser wî re digire.

Nêgarkêş: Mizawir...haya xwe ji gotinê xwe hebe, tu li ber fermanê min derdikevî ha..?

Mizawir: Haş e.. ne ez yê ku li ber fermanê te derkeve. Ji dema ku te ez aferandim, min li pêş te sond xwar ku ez ti carî hempayekî li kêlekê te daneyînim. Ez hîn jî li ser sonda xwe ya pîroz im.

Nîgarkêş: Lê niha ez fermanekî din didime te.

Mizawir: Tê bîra te, ji perestiya min a bê hempa te navê Ezazîl li min kir. Te

ez kirim serwerê Ezmanê cihana jêrîn, berdevkê Bihuştê. Hîro tu ji min dixwazî ez ji Mendîn re dakevim sicdeyê û vî mirovî ku kûpek şer û pîsî ye rakim hempayê te? Ez vê çewtiya qet nakim.

Nîgarkêş: Mizawir.. ez ê serweriyê didim û kîçax dixwazim distînim.

Mizawir: Belê.. ez vê yekê dizanim. Lê tu ne weha bûyî, ev tonekî nûye di gotinên te de diyar dibe, çawa tu hatî guhartin?

Nîgarkêş: Ez yê absolût im û qet nayêm guhartin.

Mizawir: Na,, na tu hatî guhartin, lê karê min bi vê guhartina te nîne, ez zagonên te yên ji ezelê derketin diparêzim. Ev karmendiya min a pîroz e.

Nîgarkêş: Mizawir.. li ser xwe bisekine, tu destdirêjiyê dikî ha?.

Mizawir: Hemû aferîdeyên ku te aferandin, te li gorî sîstemeke nîgarkêşiya xwe çêkirin, te hemû tişt wekî hev çênekirin. Her tiştek di ser tiştekî re te çêkir. Tu yê ku agir berî axê aferand. Agir tim serbilind e, ew tim bi jor de radiperike û li te dinhêre, ji berku evîndarê te ye. A axa ku te Mendîn jê çêkir, çiqas jor de rake dê dîsa bi jêr de vegere. Ew

xwe di nizmiyê de dibîne. Lê agir xwe di bilindiyê de dibîne. Ku tu min bi darê zorê jî ji Mendîn re daxî sicdeyê ezê disa di hundirî xwe de xwe ji wî çêtir bibînim.

Nîgarkêş: Mizawir ma ez ne Nîgarkêşê vî gerdûnî me?

Mizawir: Belê..! û bêhempayî.

Nîgarkêş: Hemû biryar di destê min de ne, jibîr meke ez ê dipirsim û pirs ji min nabin.

Mizawir: Ev rast e.. lê te ji mêj ve distura gerdûn û aferîdeyên xwe danî. Fermanê ku tu niha didî min, tu dikî min dijberî distura xwe ya pîroz bikî. Weke ez dizanim tu ne yê çewtiyekê dike û paşê sererast dike.

Nîgarkêş: Ez dibînim ku tu pir daxivî, heta tu dikî azepên min jî li hember min derxînî.

Mizawir: Ma ne te siftehîn pênûs afirand, te jê re got: Binivîse..û wê li ser Depreşa Mezin hemû bûyer ji Ezel de û ta Sermedê nivîsî, ma ev fermanê tu niha li min dikî, ew weha hatiye nivîsîn?

Nîgarkêş: Tiştên ku pênûsê nivîsî ez gişkan niha aşkere nakim, her bûyerek di wextê xwe de aşkere dibe.

Mizawir: Te ji me re got ku tu dixwazî Mendîn ji axê bafirînî ji bo bibe xelîfeyê te li ser Zemîn, a ne ji bo li Ezmên bibe hevalbendê te?.

Nîgarkêş: (Bi hêrs) Ez dibînim tu zêde berve min destdirêjiyê dikî, pêçiyên xwe dikî karê min, kî Nîgarkêş e.. ez lê tu?

Mizawir: Bêguman tu Nîgarkêşê Mezintirînî. Ez ji te re sicdeyê dikim ne bes ji bo te ez aferandim, belam ji ber ku tu xêra gelemperiyî. De çawa tu ji min dixwazî ez dakevim sicdeyê ji bo mirovekî di pişta wî de toximê şer heye, niyeta kujtin û xûnrijandina birayên xwe heye. Ewê êrîşe hemû aferîdeyên li ser zemîn bike. Ma te ti carî dî ku me, xizmetkarên te dilê hevdu qasî têlek mû derizandin?

Nîgarkêş: Law ma min ji we re negot êku ez dizanim hun nizanin.

Mizawir: Rast e,, lê rastiyeke din jî heye. Di gila Mendînê te de niyeta ji rêya te ya rast derkeve heye. De çawa tu ji min dixwazî ez wî pîroz bibînim?

Nîgarkêş: Tu di ku re dizanî ku niyeteke wî ya weha heye?

Mizawir: Te bi xwe bi zemîn re got ku, ez dikim ji te xelkekî çêbikim, dê hinek ji wan di rêya min a rast de

biçin û te yê wan têxî Bihuştê û hinek jî li dervayî rêya min a rast biçin ezê wan têxim arê dojehê.

Nîgarkêş: Belê min weha got. Xuya ye tu tiştekî jibîr nakî?

Mizawir: Na ez jibîr nakim. Zemîn qebûl nekir mistek ax bi te de, te Xişmo yê ku ji çavên wî sam dipijiqe şand û bi darê zorê mistek jê stand.

Nîgarkêş: Ez dizanim çi dikim, lê tu nizanî.

Mizawir: Ez vê rastiyê înkar nakim. Lê heta giyanê ku parçeyek ji te ye, nexwest di hundirê Mendînê te keve. A te bi zorê kire pozê wî.

Nîgarkêş: Ew parçeyek ji min e, nabe li ber fermanê min derkeve.

Mizawir: Ez dibînim ku tu hatî guhartin, zêde zorê bikartînî. Berî tu vî Mendînî baferînî, te em bi evînê kor kiribûn. Te hîro xizmetkarên xwe yên pakîze mecbûr kirin bibin koleyê vî Mendîn î û di ser re jî tu ji min jî dixwazî ez bibim koleyê wî. Çawa ez ê ji vî mirovî ku çavekî xwe li fermanekî te ye û yê din dijî fermanê te ye dakevim sicdeyê

Nîgarkêş: Mizawir.. ma ez ê çend caran dubare bikim, ez ê pirsan dikim, û pirs ji min nabin.

Mizawir: Tu ji pirsên min direvî, ji ber ku ev pirsana ji sewdanê ku te bi xwe daye min derdikevin. Ma ez ê ji ku karibim van pirsan baferînim ku te bi xwe di mejiyê min de neçandine?

Nîgarkêş: Mizawir li min binihêre..tu min digihînî rewşeke ku êdî ez tehmûl nakim.

Mizawir: Nîgarkêşê Mezintirîn..! Çima tu dixeyîdî? Ma mafê min nîne ku ez vî fermanî te baş fêm bikim ji bo kanibim serweriya van ezepê te bikim.

Nîgarkêş: Zanîna te bi sînor e, lê ya min bêsînor e.

Mizawir: Ez nêzike xeyba te nabim. Bêguman tu ji min bîhtir xeybê dizanî.

Nîgarkêş: Êêê..mesela te çiye?

Mizawir: Em li ser dozeke girig daxivin, hemû zanistî bi sînor in, çi ya min e û çi ya te ye. Gava tu nedaxivî tu bê sînorî, lê gava daxivî, gotinên te dikevin sînoran. Ez vê felosofiyê ji te hobûm.

Nîgarkêş: Law ma tu ji gengeşiyê têr nabî?

Mizawir: Mesele ne gengeşî ye. Ev pirsên ez ji te dikim têkiliya wan bi pêşeroja me gişkan re heye.

Nîkarkêş: Niha bi kurtî ji min re bibêje, tu yê ji Mendîn re dakevî sicdeyê yan na?

Mizawir: Na.. ez ji wî re sicdeyê nakim. Kîçax te ji min re got ku ew hevalbendê min e di vî gerdûnî de, ezê wê çaxê ji we herduyan re dakevim sicdeyê.

Nîgarkêş: (Bi hêrseke mezin) Mizawir di edeba xwe de bimîne. Ez Nîgarkêşê Tenha me, bê hempa me, wekî min ti Nîgarkêş ne hatin û ne jî dê werin.

Mizawir: Ha..ha, dêmek ez li ser rêya rast im ku ji Mendînê te re danakevim sicdeyê?.

Nîgarkêş: Ji vir derkeve.., te ez bi pirsan gêj kirim, nehleta min ta roja qiyametê li te be. (Bêdengiyeke giran xwe digire ser gişkan, Xizmetkar li hevdu dinihêrin, li Mizawir û li Nîgarkêşê ku ti carî wehe hêrs nebûye dinihêrin).

Mizawir: (Bi dilekî şkestî û bi dengekî melûl, weke ku gazincên xwe bi Nîgarkêş dike) Nîgarkêşê min te ez erzan firotim.

Nîgarkêş: Ez ji te re dibêjim ji vir derkeve, ciyê te ji niha û şûn ve li ser zemîn e. Tu êdî dibî Şeytan. Bes e ji te re. Ez naxwazim pirsên te bibihîsim.

Mizawir: Nîgarkêşê Mezin..! Min bi dewranan ji te re sicde kir, ez

xizmetkarê te yê tewrî nêzik û milahîm bûm. Berî ez ji hizûra te bi dilşewat dûrkevim, daxwazeke min tenê ji te heye.

Nîgarkêş: (Bi lez) Bibêje...

Mizawir: Ez dixwazim tu min ta roja qiyametê bihêlî?

Nîgarkêş: Bira weke tu dixwazî be.

Mizawir: Nîgarkêşê Mezintirîn..! Te bi zanebûn ez xistim vê rewşê. Ez bêdeng namînim, ezê ta roja qiyametê berxwe bidim.

Nîgarkêş: (Bêdeng dimîne) ...

Mizawir: Wekî ku te hîlebazî li min kir ezê jî hîlebaziyê li vî Mendînê te û kurdûndeyên wî bikim. Tuyê bi çavên xwe bibînî ku piraniya zarokên wî vê rindiya te bi bavê wan re kiriye jibîr bikin.

Nîgarkêş: Ji vir derkeve Şeytajnê nifirlêhatî. Min tu ji seroketiya xizmetkaran rakirî, serweriya ezmanê cihana jêrîn ji dest te girt. Ji vir û şin ve navê te Şeytan e.

Mizawir: Lê dîsa ez ji te re dibêjim, tuyê bibînî ku ev baweriya te ya bi vî Mendînî ne di cida ye.

Nîgarkêş: Yê ku ez dizanim tu nizanî.

Mizawir: Tu yê bibînî ku piraniya mirovan dê li pey min werin, ne li pey te.

Nîgarkêş: Ên di rêya min de biçin besî min in.

Mizawir: Dêmek tu dizanî ku dê hineke li pey min jî werin.

Nîgarkêş: Min ji te û ji wan re dojeheke mezin amadekirîye, êzingên wê kevirin, hunê di êgir de bi rijik bin.

Mizawir: Ha..ha.. dêmek te hemû tişt berî Mendîn baferînî hazir kiriye. Te pilaneke berfireh amadekiriye û min lomekar dikî çima ez ji Mendînê te re daneketim sicdeyê. .

Nîgargêş: Ji Bihuşta min derkeve. Dakeve ser zemîn û çiyê te destê te li wir bike.

Mizawir: Nîkargêşê Mezintirîn..ma ez ne xizmetkarê te yê tewrî nêzike bûm?

Nîgarkêş: Belê..

Mizawir: Ma te nizanibû ku ez ê ji Mendîn re danekevim sicdeyê?

Nîgarkêş: Bêdeng dimîne.

Mizawir: Ku ez ji Mendîn re dakevim sicdeyê, dê ev pilana te ji bin de hilneweşe?

Nîgarkêş: derkeeeef. Bira ez dengê te nebihîsim.

## Perde Tê Girtin

## Beşa Çarem

(Wêneya li ser dîwarê şanoyê hatiye guhartin. Kelayeke kevirî ya bilind e, bi deriyekî kevirî mezin e. Li ser dergeh hatiye nivîsîn: "EV BIHUŞTA NÎGARKÊŞ E". Mizawir li ber wî dergehî daketiye ser çongan û ber xwe de dilalije ji bo di bihuştê keve. Ne kes ji bihuştê derdikeve û ne kes derbasî wê dibe).

Mizawir: (Bi xwe re daxive) weyî li min û vê bêtarê.. bi hezar salan min koletî ji Nîgarkêş re kir, bi ro û şev pesnê wî dikir, serê xwe ji ser sicdeyê ranedikir û li dawiyê Nîgarkêş ez ji hizûra xwe qewitandim, Bihuşt li min kedexe kir. Ji bo çi? ji bo Mendînê ku li pêş çavên min ji celbeke genî çêkir û tavilê kire bihuştê. Ma cih di bihuştê de têre min û wî nedikir? Tu dibêjî qey min şûna wî girtibû. Lê ez qet rehet nabim ku wî jî ji bihuştê dernexim. Bira ew jî wekî min di xemgîniyê de bijî. Lê ezê çawa kanibî vî dergehî zinarî bi aliyekî dim û derbasî vê Kelê bibim. Ma ev dergeha qet dike venebe..?

(Hêdî hêdî derî bi dengekî qalind û dirêj vedibe, ronahiyeke melûl ji aliyê hundir xuya dibe. Ronahî zêde ron dibe, ji nav ronahiyê dergevanê bihuştê pasvan Razîxan derdikeve)

Razîxan: (Li Mizawir diqelibe û vediciniqe) Law tu kî? Tu li vir çi dikî? (Bi Mizawir de dinihêre) Va tuyî.. Mizawirê ku Nîgarkêş nifir lêkir û ji hizûra xwe qewitand?

Mizawir: Belê..va ez im dosto.

Razîxan: Tu li vir çi digerî? Gerek tu niha li ser zemîn bûya.

Mizawir: Ez li hêviya te me.

Razîxan: Li hêviya min î? Tu ji kîçax ve li virî?

Mizawir: Ji mêj ve ez li vir rûniştîme. Li vî derî dinihêrim, ne kes jê derdikeve û ne kes derbas dibe. Spas ji te re ku li dawiyê tu derketî. Te ez ji vê tenêtiya giran û bêdeng derxistim.

Razîxan: Êêê..tu çi ji min dixwazî?

Mizawir: Ez dixwazim derbasî bihuştê bibim.

Razîxan: Derbasî bihuştê bibî? Qey te sewdan çelqandî?

Mizawir: Hema qasî çavkutkekê ez dixwazim berî dakevim ser zemîn lê binihêrim.

Razîxan: Law ma tu dîn bûye..? Nîgarkêş ji min xwest ez kesekî derbasî bihuştê

nekim, ne jî rê bidim kesek jê derkeve.

Mizawir: Ez dizanim. Lê tu min baş nas dikî. Ez û te dostên bi hevdu re dilgerim bûn. Ma ew demên me bihevdu re derbaskirin ne şîrin bûn. Dostanî di rojên teng de bêli dibe.

Razîxan: Belê.. ew demana baş tên bîra min, heta çend caran te alîkariya min li cem Nîgarkêş kir. Ez di hundirî xwe de ji te hasûd dibûm ji berku tu li cem wî ji me gişkan bilindtir bûyî. Lê rewş hate guhartin Mizawir. Tu hîro ne yê berêyî. Ez nikanim daxwaza te bicih bînim.

Mizawir: Ji bo Nîgarkêşê me yê Mezintirîn, bihêle ez derbasî bihuştê bibim, çiqas min bêriya bîna wê kiriye. Bi serê min û te ez tê de dirêj nakim.

Razîxan: Mizawir serî min mêşîne, Nîgarkêş ez agahdar kirim ku nehêlim tu derbasî bihuştê bibî û ez bawer nakim ku tu bes dixwazî bîna wê bîn bikî, binihêre ka çi niyeteke xerab di balê te de ye.

Mizawir: Ez ji te tika dikim dosto.., ez ji te re sond dixwim ku tu xerabî di tûrê min de nîn e. Ez dixwazin çavekî lêxim wekî dîtina dawîn û ez ê

tavilê jî derkevim û dakevim ser zemîn.

Razîxan: Maşella tew tu xwe heram nahesibîne. Çawa ez ê te derbasî bihuştê bikim. Tu li ber Nîgarkêş derketî, te rikê xwe kire rikê wî, wî jî tu kirî Şeytanê nifirlêhatî. Tu dixwazî min jî weke xwe bikî? Ji roja Nîgarkêş tu ji hizûra xwe qewitandî fermanekî tûnd li min kir ku ez te bere bihuştê nekim. Ez ji te re razeke din jî bibêjim, Nîgarkêş hemû pasvan agahdar kirin ku li dergehên ezmên miqate bin û li kêderê Mizawir dîn wî agahdar bikin.

Mizawir: Bira ev derbasbûna min di navbera min û te de be, ez ji kesekî re nabêjim û tu jî ji kesekî re mebêje.

Razîxan: Ji vir dûr keve pîsê heram. Ma te bixwe ji me re nedigot ku tiştek ji Nîgarkêş nayê veşartin. Tu dixwazî ez jî weke te fermanê wî bişikînim. Tu nabînî çi hatiye serê te. Ma te di neyînikê re li xwe nenihîrî. Law bîçima te ji bîçima Xişmo bihtir samdar bûye. Tu dixwazî hevalan ji xwe re çêkî. Zû ji vir dûr keve û serê min gêj meke.

Mizawir: Law ez û te dost bûn, tu tim li pey min diçûyî, çima hîro tu pêle vê dostaniya me ya kevin dikî? Min çi xerabî bi te kirîye? Ê di navbera min û Nîgarkêş de bira di navbera min û wî de be.

Razîxan: Mizawir hewilmede ku tu bi van gotinên xwe min nerim bikî. Hîro di navbera min û te de ne dostanî û hevaltî heye. Derbasbûna bihuştê ji balê xwe çeke, tu paş istuyê xwe dibînî û bihuştê nabînî. (Dihmikekê radiwesta û hîçar qîq lê dinihêre) Bes ji min re bibêje, çi hat serê te ku tu li ber Nîgarkêş derketî? Qasku tu ji me xizmetkaran giş zanetirî û zêdetir wî kûr nas dikî. Ma te nizanibû ku peyva "Na" li hember wî kedexe ye.

Mizawir: Bi rastî ta niha ez nizanim çima Nîgarkêş li min xeyîdî? Min sistema wî ya ku ji ezel de danî hanî bîra wî

Razîxan: Wa..wa..! Tew xwe dûre tewanbariyê nabîne. Ku tu derûna wî nizanî de kî xeyne te dizane? Ez newêrim pirsekê jê bikim. De gelhoyo ji min re bibêje çima te pêçiya xwe kire tirşika wî.

Mizawir: Binihêre Razîxan, çîşkî bi min re birame. Ma me gişkan li ber wî

sond nexwar ku xeyne wî ji ti sabaran re danekevin sicdeyê?

Razîxan: Belê me sond xwar. Tê bîra min e, wî bi me re got: Xeyne min tu Nîgarkêş nîn e.

Mizawir: Ha..ha.., ma min çi kir? Nîgarkêş mirovek ji axa genî çêkir ji bo bibe xelîfeyê wî li ser zemîn. Vîna Nîgarkêş ya wî ye û kes nikane bandorê lê bike. Hinek xizmetkar bi wî re getin gengeşeyê ku ev mirova dê pîsiyê li ser zemîn biçîne û zarokên wî hevdu bikujin, xûnê birjînin. Ez neketim vê gengeşeyê. Min bixwe re digot ew Nîgarkêş e, çi dike bira bike. Mendînekî daferîne hezaran daferîne, çi ji min re ye. Lê ji nişkave Nîgarkêç ji me xwest em ji vî mirovî re dakevin sicdeyê. Xizmetkarê amede pêle sonda xwe ya pîroz kirin û daketin sicdeyê, lê mi jê re got: çwa ezê hevalbendekî li kêlekê te jê re dakevim sicdeyê?

Razîxan: Te weha bi Nîgarkêş re got?

Mizawir: Belê.. min jê re weha got. Min got tu tenê Nîgarkêş î, ez xeyne te kesekî nas nakim û ji kesekî din re jî danakevim sicdeyê. Min jêre got

ji roja te ez aferandim ev peymana min û te ye.

Razîxan: Belê tu rast dibêjî. Êêê...wî çi bi te re got?

Mizawir: Çi bi min re got. Gotinek got sewdanê min çelqand. Bêku li min binihêre ji min re got: Ez çi dixwazim hunê wekî daxwazim tevbigerin.

Razîxan: Law dîno madela Nîgarkêş weha xwest, de çi bela hate serê te ku tu xwe têxî rewşeke weha. Ew berpirsiyarê fermanê xwe ye. Paşê çî te û gengeşiya bi Nîgarkêş re, ma tu nizanî ew di xişma xwe re dirame..!

Mizawir: Tu weha bi sivikî li bûyerê menihêre Razixan. Ez wê çaxê ne lixwe ramiyam. Kesayetiya min ji min re negiring bû. Em beşek ji sistema ku wî ava kiriye. Ew bi vê daxwaza xwe vê sistemê diguhêre. A bi vê guhartinê re em giş tên guhartin. Min dî pêwîst e yek ji me vê rastiyê bê tirs jê re bibêje. Law Razîxan ku serî rastiyê werre xarkirin dê rastiya Nîgarkêş bixwe li ku bimîne? Ji te be ku kêşe sicdeya ji Mendîn re ye?

Razîxan: Belê..belê.. ne ji boşê Nîgarkêş tu ser me re digirtî. Te ez jî şaş kirim.

Mizawir: (Mizawir bi vê gotin wî kêfxweş dibe) Li min baş guhdar ke. Ez hîn di wê baweriyê de me ku ew Nîgarkêşê min e, wî ev gerdûna çêkir, û em aferandin, ew şareza ye, him bi gotinên xwe, him jî bi kiryarên xwe. Lê hinek pirs ji vê bûyerê di sewdanê min de peyda bûn. Çiqas li bersivan geriyam, negihîştim ti bersivê.

Razixan: (Razîxan li hawirdorê xwe dinihêre) Dengî xwe melûl bike û wan pirsan ji min re bibêje?

Mizawir: Bêguman berî Nîgarkêş min baferîne wî dizanibû ezê çi bikim û çi nekim.

Razîxan: Belê .. bêguman dizanibû. Li cem wî di Depreşa Parastî de pênûsê nivîsî.

Mizawir: De çima ez aferandim û paşê ez weha seza kirim?

Razîxan: Bi rastî ev pirseke giring e. Qet nehate bala min.

Mizawir: Pirseke din heye. Wî ez gor xwestek û vîna xwe aferandim û ji min xwest ez sond bixwim ku xeyne wî ji kesekî din re koletiyê

nekim. De çima ji min xwest ez ji Mendîn re dakevim sicdeyê?

Razîxan: Tu dibêjî Nîgarkêş bersivên pirsên te vedişêre?

Mizawir: Nîgarkêş naxwaze em ên di hundirî wî de bizanibin. Ew xwe di razê de dibîne, û nahêle em nêzike raza wî bibin.

Razîxan: Bi rastî tu hîn ê berê yî. Tu tim ji me kûrtir diramî û xuya ye bêtara hatiye serê te ji vê zanebûna te hatîye.

Mizawir: Ji te be mesele bes sicde ye?

Razîxan: Hîn çi ye?

Mizawir: Bêguman min fermanê Nîgarkêş şikand, ew jî pir xeyîdî, lê çima di cida ez nekujtim? Ne bes ez nekujtim, belam min çi jê xwest da min. De tu ji min re niha vê korgirêkê veke?

Razîxan: Çi da te?

Mizawir: Çi neda min. Min jê xwest heta roja qiyametê min bihêle, wî soz da min. Tiştek ji hêza min kêm nekir. Sewdanê min wekî berê ma. Ez kanim li ser zemîn di dil û sewdanê zarokên Mendîn kevim. Di tamarên wan re bimeşim. Heta nifira li min kir ta roja qiyametê ye. Ango gava

qiyamet rabe, ez ji wê nifirê rizgar dibim.

Razîxan: Belê.. pir tişt dane te. Belê madele ji te xeyîdî çima daxwazên te bi cih anîn. (bi ser xwe de mijûl dibe) Lê ji min re bibêje mebesta te çi ye ku tu yê ji nifira wî rizgar bibî.

Mizawir: Ez nizanim .. dibe ku dîsa min vegerîne xizmetkarê xwe yê berê yê tewrî nêzik û roleke din bide min.

Razîxan: Law tu van ramanan ji ku didoşî? Bi rastî te sewdanê min tarûmar kir.

Mizawir: De tu van gotinên min giş deyne aliyekî, tu yê êdî min derbasî bihuştê bikî yan na?

Razixan: Na.. bi rastî ez rêzê ji sewdanê te re digirim, lê ez ji xişma Nîgarkêş ditirsim. Bi rehetî dûre min keve, ez dikim vegerim karê xwe. (Razîxan vedigere bihuştê, dergeh li pey xwe digire. Ronahî melûl dibe û Mizawir careke din bi tena xwe dimîne. Bi poşmanî dîsa dadikeve ser çongan, û ser xwe de digirî).

Mizawir: (Bi xwe re) Kes naxwaze min fêm bike. Giş dizanin ku gotinên min rast in, lê xişma Nîgarkêş sewdanê wan tevlîhev kirîye. Çiqas çetin e gava kesek bi rastiyê êşkence dibe. Qet nedihat bala min ku dê rojek

were Nîgarkêş jî were guhartin. Law vî Mendînî çi hanî serê me? Çi razeke mezin di paş wî de heye ku Nîgarkêş wiqas pê de girêda ye?.

(Dîsa degehê Bihuştê vedibe, Tawûs bi serbilindî derdikeve).

Mizawir: (Bi Tawûs re) Wa..wa... tu çi aferîdeyekî bedew î, ev çi perên te yên rengîn in, ev çaqên zirave dirêje mermerî. Bi rastî min, min kesekî wekî te hîn nedîtiye.

Tawûs: Ez serwerê balindeyên bihuştê me, navê min Tawûs e.

Mizawir: Tu ji aferîdeyên Nîgarkêş gişkan çelengtir î, heta niha min digot qey em xizmetkarên wî tenê çeleng in.

Tawûs: Min tu nasnekirî. Tu kî ..? Tu li vir çi dikî? Çima nîşanên girî li ser rûyê te hene ? Û dengê te gelek xemgîn e, bi rastî dilê min bi te dişewite. Rebeno.. hele ji min re bibêje çi hatiye serê te?

Mizawir: Ez xizmetkarekî ji Kirobiyan im. Tiştek nehatiye serê min. Gava min ji dûr ve tu dî, ez li ser pêşeroja te xemgîn bûm. Hêsir bi çavên min ketin.

Tawûs: Li ser pêşeroja min xemgîn bûyî? Çima di pêşeroja min de çi dike were serê min?.

Mizawir: Dê rojek were tu yê ji vê rewşa xwe derkevî, çelengî û bedewtiya xwe wenda bikî.

Tawûs: Çelengî û bedewbûna xwe wenda bikim? Çawa.. kesekî tiştekî weha qet ji min re negot.

Mizawir: Belê..tuyê wenda bikî.

Tawûş: Çima..?

Mizawir: Dê rojek were tu yê pîr bibî û bimirî, hemû aferîdeyên Nîgarkê dê bimirin, wî ev raza ji aferîdeyên xwe veşartîye, xeyne yên ji dara sermedê bixwin. Ew tenê namir in.

Tawûs: Mirin çiye?

Mizawir: Mirin..! Gava tu bimirî, tu yê ji vî qilafetî xwe derkevî, dê qilafetê te li paş te bimîne, tu yê weke dûyekî, yan ewrekî di vî ezmanî de wenda bibî.

Tawûs: Lê ev cil û bergên min ên bedew dê ku da biçin?

Mizawir: Tu deran de naçin, dê li pey te genî bibin, kifikî bibin, tiji kurm û kêzik bin û paşê bibin axeke ziwa.

Tawûs: Law te ez bizdand im. Ma ez nikanim ji vê çarenûsê birevim?

Mizawir: Belê..tu kanî. Darek heye, kî jê bixwe, ew namir e.

Tawûs: Ew dara li ku ye?

Mizawir: Di bihuştê de ye.

Tawûs: Kî kane bi min naskirin bike?

Mizawir: Ku tu min derbasî bihuştê bikî, ez ê bi te naskirin bidim.

Tawûs: Çawa ez ê kanibim te derbasî bihuştê bikim? Pasvan Razîxan nahêle kes derbasî wê bibe, ne jî jê derkeve îllem bi destûra wî.

Mizawir: Ku tu dixwazî nemirî, weha bedew bimînî gerek tu çareyekê bibînî ji bo min derbasî bihuştê bikî.

Tawûs: Ez nikanim te derbasî bihuştê bikim. Lê ez ê te bi aferîdeyekî din naskirin bidim, ew kane te derbas bike.

Mizawir: Ew kî ye?

Tawûs: Ew Şahmar e. Ew kane te derbasî bihuştê bike. Ez ê niha vegerim bihuştê û ciyê te nîşanî wî bikim. Ku hat cem te, tiştên te ji min re gotin, jê re bibêje û alîkariyê jê bixwaze. Emê hersê ji wê darê bixwin

(Tawûs vedigere bihuştê, sahmar ji aliyê ku Tawûs tê de wenda bû derdikeve. Ew weke deveyekî ye, li ser çar nigan dimeşe)

Şahmar: (Berve Mizawir tê) Ma rast e ku te bi Tawûs re got darek di bihuştê de heye, kî jê bixwe namir e û dê sermedî bijî?

Mizawir: Belê.. min jê re got. Ku tu min di derbasî bihuştê bikî, ez ê wê darê nîşanî we bikim.

Şahmar: Çawa ez ê kanibim te derbasî bihuştê bikim. Ku pasvan Razîxan te bibîne qet nahêle tu derbas bibî. Dê paşê agahiyê bide Nîgarkêş û Nîgarkêş dê xezeba xwe ser min de bibarî ne.

Mizawir: Çareyek li cem min heye. Ez ê xwe wekî teneyek genim bikim, tuyê min bikî nav herdu qîlên xwe û em ê weha bi hevdu re derbasî bihuştê bibin. Pasvan Razîxan wê çaxê min nabîne.

Şahmar: De zû xwe bike teneyek genim, were di devê min de rûne, ji berku dema vegera min hat.

## Perde Tê Girtin

## Beşa Pêncem

(Wêneya li dîwarê paşîn ê şanoyê dîsa hat guhartin. daristaneke bi dar û berên crecûre ye, fêkî bi telan de daliqandîne. Li ser şano jî çend darên fêkiyan hene. Di nav wan daran de dareke gelek bedew xuya dibe, fêkiyên wê weke stêrkan diçûrisin. Mendîn li pêş wêneyê bi tenê xwe ye. Wekî dîwaneyekî car car li hawirdorê xwe dinihêre, û bi xwe re daxife) .

Mendîn: Çi ciyekî xweş e, çi darên bi gul û fêkiyên bedew in. Ev çi fêkiyên rengîn û çêjexweş in bi van daran de ne? Çûk in, mezin in (hêdî hêdî di nav darên ser şanoyê re dimeşe, fêkiyekê ji darekê qut dike û gezekê lê dixe) oooh... çiqas şîrin e, bi xwe di devê min de dihile. (Dengê çivîkan dibihîse) wa..wa.. ev çi dengên nerim û bedew in, ev dengana wekî bahînê di giyanê min de dixuşin, dilê min bi van dengan re difire (Dengê xuşexuşa avê dibihîse. Li dîwarekî şanoyê wêneya çemekî heye) Ev çi awaza vî çemî ye, gelo çi distirêye? Ji kê re distirêye? (Berve wê wêneyê diçe, dadikeve ser çongan wekî ku dike avê jê vedixwe) Çiqas ava hênik e, bi vê avê hemû şanikên

canê min hişyar bûn. Ku Nêgarkêş pir ji min hej nekira, ez nedikirim vê Bihuştê. Şalam ev rewşa bêdawî be. (Li ber wêneya çem çarmêrkî rûdine, bi kêfxweşî dîsa li hawirdorên xwe dinihêre). Lê tiştek dilê min diguvişe. Ez li vê derê bi tenê me. Kesekî wekî min tine ye ku ez pê re bidim û bistînim, pê şa bibim, ew bi min şa bibe. Ku ez hîcar Nîgarkêşê xwe bibînim, ez ê vê rewşa xwe jê re şîrove bikim. Ev tenêtiya li min giran e, ezê jê bixwazim ji bo çareseriyekê ji min re bike. Ez bawer im wê rewşa min fêm bike, ji ber ku wî bi xwe tenêtî tehmûl nekir, lewra gelek aferîde ji xwe re aferandin. (Xeweke giran tê ser çavan, û li ber wêneya çem xwe dirêj dike û dikeve xew. Ji aliyekî şano de jinek derdikeve û li ber serê wî rûdine).

Jiyan: Mendîn..Mendîno.. de hişyar be, tu pir raketî lo.., rabe min pêşwazî bike, ez ji bo te hatim.

(Mendîn sistesist ji xew radibe, teziyên xwe dikişîne, çavên xwe vedike, li kêleka xwe jineke bedew dibîne. Bi herdu destên xwe çavên xwe mist dide, ji bo bizanibe ev di hişyarê de ye lê xewnek e)

Mendîn: Tu kî?
Jiyan: Ez Jiyan im.
Mendîn: Tu ji ku hatî?
Jiyan: Nîgarkêş ez ji parsiya te ya çepê aferadim ji bo bibim jina te.
Mendîn: Tu yê deşe min nekî?
Jiyan: Ev yeka bi te de girêda ye. Çiqas tu kûr ji min hej bikî, ez ê wiqas nêzike te bibim.
Mendîn: Tu gelek bedewî, belam tu xemla vê Bihuştêyî.
Jiyan: Eynî ku ev pesna te min bextewer dike, lê pesnên ji sînorên xwe derdikevin gumanan çêdikin. (Ji nişkave Girupek xizmetkarên bihuştê xuya dibin, berve Mendîn û Jiyanê tên)
Girûpa Xizmetkaran: Mendîn ev kî ye li kêleka te rûniştiye?
Mendîn: Ev Jiyan e.
Girûpa Xizmetkaran: Çima navê wê Jiyan e?
Mendîn: Ji ber ku ji tiştekî zindî çêbûye.
Girûpa Xizmetkaran: Çima Nîgîrkêş ew aferand?
Mendîn: Ji bo min şa bike (Li jiyanê dinihêre) û ez jî wê şa bikim. (Mendîn weha dibêje û destekî xwe davêje Jiyanê ji bo wê hembêz bike)
Girûpa Xizmetkaran: Na..na.. na..!
Mendîn: Çima na.., ma ne Nîgarkêş ew aferand ji bo bibe jina min?

Girûpa Xizmetçiyan: Gerek tu qelenê wê bidî.

Mendîn: Qelen çi ye?

Girûpa Xizmetkaran: Pêwîst e tu sê caran ji Memo re nimêjê bikî.

Mendîn: Memo kî ye?

Girûpa Xizmetkaran: Ew Rêzanê herî dawiyê ye, ew yekî tewrî hêja ji zarokên te ye. Ku ne ew bûya Nîgarkêş tu nedaferandî û tu ser me gişkan re nedigirtî. (Mendên sê caran xwe xaer dike wekî ku nimêjê dike. Girûpa xizmetkaran dûre wan dikevin û ji şanoyê derdikevin, Mendîn û Jiyan bi tena xwe dimînin)

Mendîn: (Bi Jiyanê re ) Çiqas jiyan li vir xweş e, ez gelek bextewer im bi vî cî û bi hebûna te. Em ê di jiyaneke evînî û bextewerî de sermedî bijîn.

Jiyan: Tu zanî ku ev ciyê bedew, ev jiyana bextewer û evîna di dilê me de dikele gumanan bi min re çêdike.

Mendîn: Ji niha de keleman ji min re dermexe. Ev gumanên te ji ku tên?

Jiyan: Ez ditirsim ev giş xewnek be û berdewam nebe. Wê Nîgsrkêş îllem tiştekî ji me bixwaze.

Mendîn: Çi ji me dixwaze bira bixwaze, em ê weke daxwazên wî bikin. Bira dilê te aram be, Nîgarkêş bi zimanê xwe

li hember xizmetkaran bi min re got: Here tu û jina xwe di Bihuştê de bijîn û li wir hun ji çi hej dikin bixwin.

Jiyan: Tu dibêjî bes ji bo vê rewşa xweş em aferandin, an ji bo ji xwe re li me binihêre?

Mendîn: (Mizawir bi kelegirî ji aliyê çepê yê şanoyê dikeve, nêzike wan dibe. Mendîn û Jiyan ji nişkave lê dinihêrin) Law tu kîyî? xêre tu digirî, ma kes li ciyekî weha digirî?

Mizawir: Ez ji bo we digirîm ne ji bo xwe. Hun du mirovên ji xizmekarên Nîgarkêş giş bedewtir in. Ev xêra hun tê de, ji we re namîne. Dê dawiya vê bexteweriya we were, hunê kal û pîr bibin. Paşê bimirin. Ev ciyê xweş û bedew dê li pey xwe bihêlînin.

Mendîn: Law tu çi dibêjî..? Nîgarkêş em kirin bihuştê ji bo em tê de wek xwe bimînin. Wî li hember xizmetkarên xwe gişkan ev gotina got. Heta xizmetkarekî wî yê nebixêr ji min hasûd bû, Nîgarkêş jî ji bo min gelek jê aciz bû, heta ew ji hizûra xwe qewitand.

Mizawir: Nîgarkêş hun ji axê çêkirin ji bo li ser zemîn bijîn a ne li vir. Li wê

derê hemû aferîdeyên Nîgarkêş dê ji ava kalbûn û mirinê vexwin. Mirin li ser eniya we hatiye nivîsîn. (Mendîn xemgîn dibe, rûyê wî tal û tirş dibe, li Jiyanê dinihêre, gumana wê tîne bîra xwe. Jiyan jî di bêdengiyê de serê xwe dihejîne)

Jiyan: Min bi te re negot Mendîno..! Ku ev rewşa me ya xweş nîşana gumanekê ye, de bibihîse Mendînê min, dê çi bi serê min û te de were.

Mendîn: (Bi Mizawir re) Ez ê ji Nîgarkêş rica bikin ji bo me li vir bihêlîne. Em naxwazin herin wê dera ku te nav lêkir zemîn.

Mizawir: Ev hêviyeke pûç e. Armancên Nîgarkêş kesek xeyne wî nizane. Wî berî min û we baferîne, blanek ji ezelê de danîye. Ew plana xwe naguhêre.

Mendîn û Jiyan: (Bi hev re) Qe çareyek tine ji bo em Nîgarkêş razî bikin ta me li vir bihêlîne?

Mizawir: Kes nikane bandorê li Nîgarkêş bike. Ew ji danûstandina aferîdeyên xwe hej nake, hun vê yekê ji min bipirsin. Lê hun kanin li vê derê çareseriyekê ji xwe re bibînin.

Mendîn û Jiyan: (Bi hev re) Çawa emê kanibin li vir çareseriyekê

bidestxînin. De  xêra xwe çavê me veke?.

Mizawir: Hun vê dara ku fêkiyên wê wekî stêrkan diçûrisîn dibînin?

Mendîn û Jiyan: (Bi hev re) Belê em dibînin, ew ji darên bihuştê gişkan çelengtir e.

Mizawir: Ku hun ji fêkiyên wê bixwin, hun ne kal dibin û nedimirin. Belam hunê sermedî li vir bijîn. Ne bes weha jî, hunê zêdetirîn zanyar jî bibin.

Mendîn: Bes Nîgarkêş bi min re got ji vê darê mexwe.

Mizawir: Nîgarkêş ev dara li we kedexe kir ji bo hun bê hişmend bimînin û sermedî li vir nejîn. Nêzik ewê ew bişîne ser zemîn.

Mendîn: Ez ditirsim em jê vê darê bixwin Nîgarkêş ji me bixeyîde.

Mizawir: Ez ji we re sond dixwim, ev tiştên ez ji we re dibêjim rast in û biryar a we ye. (Mendîn dikeve dudiliyekê, xwe dide aliyekî û bi ser xwe de mijûl dibe, bi xemgînî dest bi girî dike).

Mizawir: (Bi destê jiyanê digire û wê dibe ber darê) Baş lê meyzeke, çendîn bîna wê xweş e. Di vê buhiştê de ti bîn wekî bîna wê nîn e. Ku tu jê bixwî tu yê bibî sorperiya bihuştê. Ne

pîrbûn nêzike te dibe û ne jî mirin.(Mizawir di aliyekî şano de winda dibe)

Jiyan : (Jiyan fêkiyêkê ji darê jêdike, gezekê lêdixe, li Mendîn dinihêre û jê re dibêje û berve Mendîn vedigere) Mendîno.. dilyarê min.. bi min re bixwe, çiqas fêkiyeke şîrin e, binihêre min xwar û tiştek nehat serê min.

Mendîn: (Ji ciyê xwe nalive) Cerkî vî mêvanî bi me re got hunê kal û pîr bibin, bimirin, daxwaz û şehwet di canê min de girgîn bûn. Ez dibêjim madele rojeke weha dê were serê me. Emê kal û pîr bibin û bimirin, tu wê fêkiyê deyîne aliyekî û were cem min ji bo em berî mirinê daxwaz û şehweta xwe têr bikin. Paşê ci dibe bira bibe.

Jiyan: Na..na.. dilyarê min. Ez nayêm cem te. Ez ê daxwaz û şehweta te paşê têr bikim. Di vê wexta ku em li hember pêşerojeke tarî ne kêfa te rabû û li şehweta xwe diramî bêhişo..!

Mendîn: Lê Jiyanê ez ji te rica dikim. Tirsa mirinê ez şaş kirim, ez dixwazim berî mirinê em ji van daxwaz û şehwetan têr bibin.

Jiyan: Heyî hişkêmo..tu were em berê fêkiyê bi hevdu re bixwin ji bo em ji mirinê rizgar bibin. Gotina mêvanê me rast e. Paşê dilê me çi bixwaze em ê serbest bikin. (Mendîn radibe, berve Jiyanê diçe, wê hembêz dike ji bo ramûse, lê Jiyan rûyê xwe bi aliyê din de badide)

Jiyan: Na..na..tevleşe min me be. Ku tu ji vê fêkiyê nexwî, ez nahêlim tu tiştekî bi min bikî. (Mendîn fêkiyê ji dest Jiyanê digire û dixwe. Ji nişkave ew dibînin ku tazî ne. Mendîn bi lez destê Jiyanê digire û bi hev re dirivin paş darekê ji bo xwe veşêrin).

Mendîn: Te dî mêvanê me çi hanî serê me? Ew Mizawir bû. Te dî çawa bi me keniya? Gava min dengê wî bihîst ez lê ketim gumanan ku min ev denga berê bihîstîye. Nîgargêş bi zimanê xwe bi min re got ev dijminê te ye. Haya xwe jê hebe, ew ê hewilbide ku te û jina te ji bihuştê derxîne. (Ji nişkave dengê Nîgaekêş tê).

Nîgarkêş: Mendîn.. law Mendîno.. tu li kê derêyî?

Mendîn: Ez li vir im Nîgarkêşê min.

Nîgarkêş: Çima tu xwe ji min vedişêrî?

Mendîn: Ez ji te fedî dikim.

Nîgarkêş: Çima tu ji min fedî dikî, ma te ji wê dara ku min li te kedexe kir xwar?

Mendîn: Jiyanê bi min xwarin da.

Nîgarkêş: Jiyanê..çima te rebenê min xapand?

Jiyan: Mizawir ez xapand im.

Nîgarkêş: Madele te ev yeka kir û te dara min birîn kir, tu yê meh bi meh carekê birîn bibî, tuyê bi xûnê avis bibî û gava tu bizêyî, tuyê bi êşecanê bizêyî û çend caran nêzike mirinê jî bibî.

Mendîn: Nîgarkêşê Mezintirîn..! em li hember te gunehkar in, tu Milahîmê Mezinî, em aferîdeyên te yên lawaz in. Em ji te tika dikin tu me bibexşînî.

Nîgarkêş: Niha ne wexta bexşînê ye. Hele hûn niha ji bihuşta min derkevin, û dakevin ser zemîn. Nabe gunehkar di bihuşta min de bijîn.

Mendîn: Ezbenî çîşkî li me guhdar bike.. tu çi dixwazî em ê bikin, xeyne daketina li ser zemîn. Bi navê teyê şîrin em nikanin li wir bijîn.

Nîgarkêş: Law Mendînê gunehkar.. min zêdetir mexeydîne. Ji aferîdeyên min kes nikane li hember min bibêje na. Ma te bi çavên xwe nedî

min çi hanî serê Mizawir. De bi lez û bêdeng ji bihuştê min a pakîze derkevin, ev ne ciyê gunehkaran e.

Mendîn: Nîgarkêşê Mezintirîn..! ma te ez bi destê xwe çênekirim?

Nîgarkêş: Belê..

Mendîn: Ma te ji giyanê xwe giyan pife pozê min nekir?

Nîgarkêş: Belê..

Mendîn: Ma rehma te ji xişma te ne nêzikî min e?

Nîgarkêş: Belê..

Mendîn: Ma ne te ez kirim bihuştê?

Nîgarkêş: Belê..

Mendîn: De çima tu min weha seza dikî û dikî ku min ji bihuştê derxînî? Ma gunehê min efû nabe.

Nîgarkêş: Gunehê ku te kir pir mezin e û sezaya wî jî gerek mezin be. Ev guneha dê di zarokê te de jî berdewam be. De tu û Jiyanê bê pitepit ji bihuştê derkevin û dakevin ser zemîn. Li wir bi keda xwe bijîn. Li ser zemîn ji min bexşînê bixwazin.

Mendîn: Nîgarkêşê min ez dixwazim ji te bipirsim, ev gunehê ku min kir, min ji cem xwe de kir, lê berî tu min bi destê xwe çêbikî te li ser pêşeroja min nivîsî?

Nîgarkêş: Ew berê di deftera te de hatiye nivîsîn.

Mendîn: Ma te nivîsî yan kesekî din nivîsî?

Nîgarkêş: Min ferman da pênûsê ku dike di gerdûna min de bibe binivîse.

Mendîn: Êêê.. ma tu nikanî demê paş de vegerînî û deftera xwe ji gunehê min pakîse bikî, an tu naxwazî?

Nîgarkêş: Mendîn..tu jî pêçiyê xwe, wekê Mizawir, meke nav karê min. Ji bo aferîdeyekî weke te ez demê paş de venagerînim û karê xwe yê ta niha kiriye dubare nakim.

Mendîn: Li min bibûre ezbenî. Ez ji wê dera ku jê re dibêjin zemîn pir ditirsim, lewra sewdanê min lihevketîye.

Nîgarkêş: Metirse.. min yaqûtek ji bihuştê daxistiye ser zemîn, ew wekî xaniyekî ye, navê wî Kehbê ye. Du deriyên xwe hene. Yek li aliyê rojhilat e û yê din li aliyê rojava ye. Hunê dakevin ser zemîn, li Kehbê bigerin, ku we dî, li dor wê re bizîvirin, wekî te dî çawa xizmetkarên min li vê derê dor Kulîna min re dizîvirîn. Tu û jiyanê li wir ji min re sicdeyê bikin, weke li vir xizmetkarên min ji min re dadikevin sicdeyê. Wê çaxê ez ê te û Jiyanê bexşîn bikim.

Mendîn: Nîgarkêşê min, em li vê derê zêdetirîn hewceyê bexşîna te ne. Em naxwazin dakevin ser zemîn. Gor Mizawir ji me re got li wir mirin heye.

Nîgarkêş: Min weha biryar girt û biryarên min nayên guhartin. Li ber min ne bigirî û ne jî bilalije.

Mendîn: Berî ku em dakevin jêr, ez dixwazim ji te fêm bikim, gava Mizawir derbasî bihuştê bû ji bo me bixapîne, ma te ew nedî?

Nîgarkêş: Belê min dî.

Mendîn: Ma te nikanibû ew nehîşta derbas bibûya?

Nîgarkêş: Min kanibû.

Mendîn: De çima te hîşt derbas bibe, min û Jiyanê bixapîne, me li ber te sûcdar bike û çarenûsa me bi tevahî biguhêre?

Nîgarkêş: Yê ku ez dizanim hun nizanin.

Mendîn: Rast e, lê gava te ez li hember xwe zindî kirim, te got: Ez Nîgarkêş im, ez xêra bê hempa me.

Nîgarkêş: Belê ez weha me.

Mendîn: Madele tu xêra bê hempa û gelemperî, û gor te ji me re got berî tu vî gerdûnî ava bikî xeyne te kesek tinebû, de ev gunehê min ji ku hat?

Nîgarkêş: Mendîno.. tu jî wekî Mizawir ji danûstandinê hej dikî, ma Mizawir ti ders dane te?

Mendîn: Li gor te ji me re got, tu çavkaniya hemû tiştîyî, de çima tu me bi vî gunehî sûcdar dikî? Ma tiştek ji vî gunehî me nagihêjê te jî.

Nîgarkêş: Mendîno di edeba xwe de bimîne, zêdetir min mexeydîne ta ez tiştekî din neynim serê we.

Mendîn: Baş e, bira wekî tu dixwazî be. Lê te bi destê xwe ez çêkirim, ji giyanê xwe yê pîroz giyan da min, de çawa tu qebûl dikî di eynî demê de min li ser zemîn bêşînî, nexweş bikî û zihêra mirinê bi min vexwarin bidî? Ku ne ji bo min, a ji bo parçegiyanê xwe yê di min de min bibexşîne.

Nîgarkêş: Hîştina te û Jiyanê di bihuûtê de ji balê xwe çeke. Lê metirse, ez te tenê li wir nahêlînim. Ku tu weke ez dixwazim bikî, ezê dîsa piştî mirina te û Jiyanê vegerînim bihuştê,

Mendîn: Nîgarkêşê min, ma tu nakokîyekê di fermanê xwe de nabînî? Tu min ji bihuştê gunehkar derdixî û dikî min daxî ser zemîn, Mizawir berdî nav zarokên min ji bo wan bixapîne, ji rêya te derxîne. Hinek dê bibin para dojehê û hinek jî bibin para bihuştê.

Bi rastî te sewdanê min kiriye gêjgerînkekê.

Nîgarkêş: Di her fermanekî min de wateyeke cuda heye, ez hinek wateyan rava dikim û hinekan jî veşartî dihêlînim ta dema xwe tê.

Mendîn: Bi rastî ez nizanim tu xêrê ji min re dixwazî yan xerabiyê. Te hîşt Mizawir li vir min bixapîne û rûyê min li hember te reş bike. Lê çima dîsa tu wî bi min re dişînî ser zemîn ji bo li wir jî rikî xwe bike rîkî min û zarokên min? Ma ez û wî bi hevduda grêdayî ne?

Nîgarkêş: Metirse.. ez ê piştgiriya te bikime, û nahêlim tu tenê li hember êrîşên wî bisekinî.

Mendîn: Wextê ku te li vir ti xêr bi min nekir, te ez ji Mizawir neparastim, de li ser zemîn tuyê çi xêrê bi min bikî? Li wê derê xêr nîne. Mizawir li ber çavên te ez xapandim û te tiştek nehanî serê wî, de wê li dûre te hîn çi bîne serî min?

Nîgarkêş: Ez ê Rêzanên xwe ji zarokên te re bişînim, ewên rêya min a rast raberî zarokên te bikin û ku zarokên te li pey wan biçin, dê kanibin xwe ji Mizawir biparêzin.

Mendîn: Nîgarkêşê min yê mezin, bibore, bi rastî ez di gumanan de me, ji min ve xuya dibe wekî ku te û Mizawir li ser çarenûsa min a û zarokên min lihevkirîye.

Nîgarkêş: De bes e gunehkarê geweze.

Mendîn: Bibore Nîgarkêşê min. Ez dixwazin fêm bikim, madele tu dikî weha Mizawir bere ser min û zarokên min dî, de çima te ez eferandim? Ez mirov im ew xizmetkarê teyî hêzdar e, te mirin danî ser min û ew jî ta roja qiyametê mirinê nabîne. Tu bixwe min û zarokên min dikî nav pençeyê wî? De tu kanî ji min re bibêjî tu bi me kê re yî?

Nîgarkêş: Ez bi sistema xwe re me. Sewdanê teyê qasî sêva te xar nikane bigihêje sînorên vê sistema min.

Mendîn: Mizawir li ber fermanê te aşkere derket, te ew ji bihuştê qewitand, lê dîsa wî çi ji te xwest te da wî. De çima em cara yekem bexşînê ji te dixwazin û tu nadî me.

Nîgarkêş: De dakevin ser zemîn gunehkarê geweze, li wir tu kanî azad baxivî.

## Perde tê Girtin

## Beşa Şeşem

(Wêneya li dîwarê şano yê paşîn Çolek e wekî beyabanê ye. Li jêrî wênyê wêneya goreke kevin heye bi zemîn re dûz bûye, hinek mit li ser û li hawirdorê hişk bûne. Kalekî pirpirî bi gopalekî xwar ji aliyê çepê yê şano tê ser şano û li ber gorê disekine.

Mizawir: Mendîn.. Mendîno.. rabe..rabe ma tu ji mirinê têr nebûyî?

(ji aliyê şano yê din mirovek bi kefenekî ziwa tê ber wêneya gorê, wekî ku ji gorê rabûye, axê ji xwe dadiweşine, li hawidorê xwe dinihêre, paşê bi matmaî li Mizawir dinihêre).

Mendîn: Çiqas mirineke giranedirêj bû. Ma qiyamet rabû? (ji Mizawir re dibêje)

Mizawir: Qiyameta çi.. halê çi..?

Mendîn: Wekî ku ez dengê te nas dikim. Tu kî? Law ma tu ne Mizawirî?

Mizawir: Belê..belê , ez ew im..te hîn ez jibîr nekirime?

Mendîn: Ma tu yê ez jibîr bikin. Careke din tu hatî hember min? Hey nifira Nîgarkêş ji ser ranebûyo.., te çi hanî serê min? Te ez xapandim, ji bihuştê derxistim, li ser zemîn perîşan kirim. Tu hîcar ji min çi dixwazî?

Mizawir. (Bi xemgînî) Belê min ev tiştana giş hanîn serê te. Lê kê ez kirim vê rewşa ez tê de?

Mendîn: Tu dîsa dikî xefkekê li min vedî? Çi xwe perîşan dikiye.!

Mizawir: Mendîno..carekê ji caran hişmend birame.., hîro em herdu li hember bêtareke mezin in.

Mendîn: Law ma ti bêtar ji bêtara ku te hanî serê min mezintir heye?

Mizawir: Em herdu êdî kal bûne. Binihêre demê çi hanî serê me. Tu di gora xwe de civiliye, hestî û çerim maye, ez jî bûme kalekî pirpirî. Gerek em dûre kînên xwe yên zeman de kevin. Were em careke din bi hişmendî li hemû bûyeran vegerin.

Mendîn: Ha..ha.. qiyamet hat ber derî, dawiya fenûfûtên te hat, lewra tu weha daxivî. Ezê bibînim çawa tuyê di êgir de biqewirî. Bira qarewarên te bigihêjin ezmanê heftan. Lê berî ku tu bişewitî ez dixwazim çend pirsan ji te bikim.

Mizawir: Ti wateya pirsan hîro nîn e.., dem paş de venager e.. wê roja nebxêr a ku ez ji hizûra Nîgarkêş hatim qewtandin careke din neyne bîra min, ji ber ku ew roja tewre xemgîn e di vê jiyana min e dûrûdirêj de.

Mendîn: Maşella.. tu dikî niha xwe li hember min bê sûc bikî? Here .. here xwe li hember Nîgarkêş bêsûc bike. Ma te nizanibû ku wê ev roja qiyametê were?

Mizawir: Mendîno.. li min guhdar bike.. çi tiştên ku min wê çaxê gotin rast bûn, û giş rast derketin. Tu nizanî zarokên te li pey te çi kirin?

Mendîn: Tu ji min re mebêje çi kirin, ji min re bibêje te çi hanî serê wan hîlebazo?

Mizawir: Belê..eynî ku demeke dirêj min ew xapandin, bi serê wan lîst, şer û kîn di navbera wan de çandin, lê paşê...

Mendîn: Lê paşê çi..?

Mizawir: Wan pêle min kirin û ez derbas kirim. Bi xwe cihan tijî şer kirin, fesadî, kuştin, sitemî û zordarî ava kirin.

Mendîn: Dîsa sedem giş tu yî, ma ne tu yê bi Nîgarkêş re got ku ezê zarokên Mendîn ji rêya rast derxînim?.

Mizawir: Erê..erê.. min weha got û weha jî kir. Lê hîcar sedem ne ez im.

Mendîn: Mizawir, ku ne tuyî, de wê kî be? Ma ti Mizawirên din jî li ser zemîn derketin?

Mizawir: Na..na....ti Mizawirên din derneketin. Lê sedem hîcar tuyî.

Mendîn: Ez iiiiim?. Hey pîsê heram, cerkî ez mirime, ez ji vê gorê derneketim. Tu dikî bi bêbextî tiştên te kirine di yaxê min kî.

Mizawir: Na..na.. mebesta min ne tu bixwe yî, a ew toximê şer yê di pişta te de li ser zemîn çilok da, weke nexweşiya pençeşêrê belav bû û rûyê zemîn mişt kir.

Mendîn: (Bi henekî) Wa.. wa.. çi tu bêgunehî..ev zimanê neçar te ji ku hanî pepûko? Ma ne tu bûyî yê ku bi Nîgarkêş re got: Ezê wan bixapînim, ji rêya te ya rast derxînim. Te aşkere got ku tuyê destê wan ta zendan di şer de bigerînî.?

Mizawir: Belê.. belê.. min weha got.. lê wê çaxê Nîgarkêş bi xwe hêz da min ji bo ez kanibim bi serê wan bilîzim. Ku ne ew hêza bûya ma minê çawa kanibûya careke din derbasî bihuştê bibûma tu û Jiyan bixapanda? Wê hêzê hevsarek kiribû serê min û ez dajotim. Ma tu nizanî gava hêzek dikeve destê te, tu mecbûr dibî bi kar bînî, an jî ew hêza dê te bi kar bîne. Em giş rebenê hêza gelemperî ya Nîgarkêş in kîmhişo.

Mendîn: Ev hêza ku tu ji min re dibêjî, ma ne di destê hemû xizmetkarên Nîgarkêş de jî bû? Çima wana wekî te nekir?

Mizawir: Na.. na, Nîgarkêş ew hêza dabû min tenê, ew ji vîna min mezintir bû. Lewra li dawiyê ez bûm qurbana wê hêzê.

Mendîn: (Bi tenazî) Wa.. wa çi xwe bextereş dike. Law ma tu ji van gazinên xwe namînî? Tu çi xwe li hember min bêçare dikî. Tu dixwazî dilê min bi te bişewite? Gava tu di qetranê de bibî rijik, wê çaxê dê dilê min honik bibe. Wê çaxê ezê hemû fenûfûtên te bînim bîra te.

Mizawir: Hişkêmo ..tu qet nagihêjî gewhera dozan. Ma te wê çaxê bi rastî bawer kir ku Nîgarkêş xwest te ser min re bigire û te di bihuştê de bihêle?

Mendîn: Çawa ezê bawer nekim, wî bi xwe bi min re got û ji te xwest tu ji min re dakevî sicdeyê? De ezê bi gotinê wî bawer bikim lê bi yê te pîsê heram?

Mizawir: Berî te baferîne ji me re aşkere got ku dike te ji zemîn re baferîne. Ew hewceyê min bû ez li ber wî derkevim. Ew bi te keniya û xwest demkî te di bihuştê de bicih bike. Ma wî nikanibû nehîşta ez derbasî bihuştê bibûma? Ew dara te û Jiyanê jê xar hicet bû ji bo pilana di serê wî de pêk bîne.

Mendîn: Wa..wa..Xapînoko..tu hîcar dikî bêtara min bavêjî ser milê Nîgarkêş. Ew xêra gelemperî ye. Fenûfût li cem wî nîn e.

Mizawir: Xêra gelemperî dibêje..! heyî hişkêmo..! De ji min re bibêje, serkêşiya min û şikandina te fermanê Nîgarkêş di bihuştê de ji ku hat?. Dîno.. çîşkî birame. Ma Nîgarkêş tu ji bo xêrê aferandî? Ji te be wê çaxê ez dijî te derketim? Ez dijî vîna Nîgarkêş ku xwest şer li ezmanê pakîze ava bike û daxîne ser zemîn. Ku xêr paçeyekî wî ye, şer parçeyê wî yê din e. Bira li vê dawiyê tu bizanibî, eynî ew berî me hebû, lê hebûna wî bi hebûna me de hat girêdan.

Mendîn: Yanî tu dixwazî dibêjî, bê ku em bizanibin, em lîstika vîna wî ya veşartî ne?

Mizawir: Ha.. ha.. çîşkek mejî di serî te de heye. Ez ji despêka karê Nîgarkêş de bi wî re bûm. Ez aferîdeyê ku wî baş nas dike. Ew ji me bihtir bi tenahiya xwe aciz bûbû. Piştî ku wî em aferandin, ew bi mezinahiya xwe hest bû. Ango, gava hîn bi tena xwe bû, wî nikanibû mezinahiya xwe bipîva. Û li dawiyê ez û te bûn qurbana vê mezinahiya wî.

Mendîn: Nelet li te be. Tu dîsa dikî bi sewdanê min bilîzî? Min bihuşt wenda kir, min li ser zemîn nanê xwe bi xuya xwe stira, de hîcar tu dikî çi bînî serê min?

Mizawir: Law tu çiqasî bextereş î..! gava tu hîn pûtek bûyî, min tu li ber deriyê bihuştê dîtî, ez ketim devî te û di kûna te re derketim, min wê çaxê têderxist ku tu aferîdeyekî valayî.

Mendîn: De bes e..bes e, pêzoyê min..! Ji min re pesnê xwe meke, zatin vê nexweşiya te ev bêtara hanî serê me. Heta li vê dawiyê jî tu xwe pozo dibînî.

Mizawir: De were ez ji te re razekê bibêjim. Tu zanî ku zarokên te ji te jîrtir derketin? Sibhanellah ji weliyan pelî û ji peliya welî.

Mendîn: Ha..ha..law tu û şarezahiyê çîyê hev in?

Mizawir: De bibihîse dîwaneyo, zarokên te em ji bîrkirin?

Mendîn: Em kî?

Mizawir: Ez, tu.. û heta Nîgarkêşê me.

Mendîn: Mebêje..! Çawa kanin me jibîr bikin?

Mizawir: Ew êdî jiyana xwe bê me didomînin. Min bi xwe re digot ev

nîşana roja qiyametê ye, ji ber ku min bawer nedikir dê

Nîgarkêş rewşa wan qebûl bike. Min digot dem hat ku xişma xwe ser wan de bibarîne. Lê ta niha tiştek nekir.

Mendîn: Tu dîsa dixwazî mejiyê min bikî gêjgerînkekê hey kûpê derewan?

Mizawir: Na..na.., ez rastiyê dibêjim. Di vê rewşa nû de, ez û te herdu di eynî çalê de ne.

Mendîn: Eynî ku ez ji te nefret dikim.. lê ev gotinên te bala min dikişînin, wekî ku ez dixwazim ji nû ve li hemû tiştî veger im.

Mizawir: Ha..ha.., çavê te ron bin. Tu zanî ku ji nav zarokên te hinek derketin bi yên din re dibêjin ku ez, tu û Nîgarkêş di endîşeyên wan de peyda bûn. Ev gotinên wan ez pir xemgîn kirim.

Mendîn: Em di endîşeyên wan de çêbûn? Ev çi bêje ye?

Mizawir: Belê..belê.., eynî ez li hember Nîgarkêş derketim, lê ti carî min ew înkar nekir, min qet negot ku ew ne rastiyeke sermedî ye, an ew ne yê ez aferandime.

Mendîn: Ev zarokên min dîn bûne?

Mizawir: Tew hinek ji zarokên te dibêjin em hersê mirin.

Mendîn: Wa..wa.. ! Ev çi hişkêmî ye? Ku bibêjin Mendîn mir, ev rast e, lê Nîgarkêş ti carî namire û tu jî ta roja qiyametê namirî. Nîgarkêş weha soz da te.

Mizawir: Hinek ji nav zarokên te dibêjin ku em endişeyên mirovên despêkîn e. Ku me tînin bîra xwe dibêjin ev kelepora me ya kevnar e. Ango ne Nîgarkêş hebû, ne ez û ne tu.

Mendîn: Bi rastî ev zarokên min dîn bûne. Ev çi gotinên tewş in.

Mizawir: Xweziya ew li vir rawestiyana.

Mendîn: Law zêde min metirsîne, ma bêtar ji vê bêtarê mestir hene?

Mizawir: Ew dibêjin ti Nîkarkêşan ew neaferandin.

Mendîn: Lê kê ew aferandin?

Mizawir: Dibêjin em zarokê sirûştiyê ne. Bavpîrên wan ên despêkî ev rastiya nizanibûn. Lewra di endîşeyên xwe de Nîgarkêşek eferandin û hebûna mirovan kirin istiyê wî. Piştî ku zanistî pêş ket, ew êdî ne hewceyê van endîşeyên kevnar in. Wan em hersê ji baweriya xwe derxistin û di jiyaneke bê me de dijîn.

Mendîn: Çi zarokên nankor in..! Tew xwe zana jî dibînin.

Mizawir: Tu zanî ev baweriya wan çiqas ez xemgîn kirim. Ji wê çaxê de ez vegeriyam li aliyê Nîgarkêş bisekinim.

Mendîn: Bi rastî ku gotinên te rast bin, heft rehme li te be. Eynî ku tu li ber Nîgarkêş derketî, lê te ti carî ew înkar nekir.

Mizawir: Tu ji xwe re di gora xwe de raketiye û nizanî çi li cihanê qewimî. Zarokên te niha bawer dikin ku jiyan sermedî ye. Ne qiyamet heye û ne cihaneke din. Ew dibêjin sermed taybetmendiya vî gerdûnî ye. (Bi xemgînî) ezê çi ji te re bibêjim çi nebêjim Mendîno.

Mendîn: Law ev çi nexweşiye hatiye serê zarokên min. Gerek em Nîgarkêş agahdar bikin, bira zemîn rake û ser wan de hilweşîne. Ne ew bin û ne hebûna wan be.

Mizawir: Bi rastî ev rewşa wan sewdanê min zîrûzeber kir. Ji roja ku zarokên te di vê rêya xwe ya nû de meşiyan, kalbûnê êrîşe min kir. Tu dibînî ez çiqas kal bûme. Hêza min lawaz bû. Wextekê ez weke birûskê ji aliyekî cihanê diçûm aliyê din, ez di sîngê mirovan de radiketim, di tamarên wan de dimeşiyam. Lê niha..! Ew hêza

min giş pûç bû. Ez êdî li hember wan neçar im. Tu dibînî ez bi vî gopalî dimeşim.

Mendîn: Law te ev cihana û cihana din jî li ber çavên min reş kir. Lê Nîgarkê çi dikî?

Mizawir: E ê çi ji te re bibêjim..! Ew xemgîn e. Belam pir xemgîn e. Dibêjin kesekî pêşwazî nake. Tê bîra te ew çiqas hêzdar bû, çi dixwest digot bibe.. û dibû. Zarokên te dem ji dest wî derxistin, ew êdî nikane serdariya demê bike. Zarokên te destên Nîgarkêş ji ser dem û jiyana xwe rakirin.

Mendîn: Lê ka Rêzanên Nîgarkêş ? Wî soz da min, dê Rêzanan bişîne nav zarokên min ji bo rêberiyê ji wan re bikin, wan di nav pençeyên te de nehêlînin, ji bo ji rêya Nîgarkêş bernedin.

Mizawir: Belê Nîgarkêş gelek Rêzan şandin nav zarokên te. Lê xweziya Nîgarkêş Memo nekira Rêzanê dawiyê.

Mendîn: Çima? Ma ne wî got ku gerdûn giş ji bo Memo avakir.

Mizawir: Piştî Memo mir zarokên te filitîn.

Mendîn: Qasî ez dizanim Memo Rêzanê Axirzemanê ye. Ango jiyan li pey wî

direj nake, dê Nîgarkêş Qiyametê rake.

Mizawir: Gava Memo bi zarokên te re got ku ew Rêzanê dawiyê ye, hêviyên wan ji Ezmên qut bûn, lewra mecbûr bûn dozên xwe bi xwe li ser zemîn çareser bikin. Herku dozeke xwe çareser dikirin sewdanê wan ji ezmên rizgar dibû.

Mendîn: Tu dixwazî bibêjî ku bandora gotinên Memo li ser wan dirêj nekir.

Mizawir: Mesele ne bandora gotinên Memo ne. Bêgoman gotinên wî ji Nîgarkêş bi xwe weşiyan, lê li ser zemîn ev gotinana ketin pêvajoya dema mirovan. Wek me dizanibû ku Nîgarkêş di ser demê re ye, yanî li dervayî meşa demê ye. Lê gava mirovan ew wekî xwe kirin hundirê demê Nîgarkêş di sewdanê wan de kete pêvajoya guhartinê. Zarokên te dibêjin di pêvejoya demê de ne tiştek û ne kesek li ciyê xwe dimîne. Hemû tişt gor zagonên sirûştiyê tevdigerin. Bi vê tevgerê re guhartin dibe zagona sereke. Lewra piştî demekê gotinên Memo kevin bûn, û li paş mirovan man.

Mendîn: Ev çi deriyên ecêbin di sewdanê zarokên min de vebûn.

Mizawir: Tu zanî zarokên te li ser Rêzanan çi dibêjin?

Mendîn: Ew dînana çi dibêjin?

Mizawir: Dibêjin her Rêzanekî roleke xwe di dîroka mirovan de lîst, lê ji aliyekî din ve ew ne dirust bûn. Ku di dema wan de tixtorên sîkolojîk hebûna dê rastiya wan baş fêm bikirana, belam di nexweşxaneyê kirina.

Mendîn: Ev nûçeyên te mejiyê min ji kokê de dihejîne. Çawa Nîgarkêş ta niha ew serbest hîştine? Tê bîra te çiqas em bextewr dibûn gava bi me şa dibû û her ku dixeyîdî tirs wekî bahozekê di dilê me de radibû.

Mizawir: Ew dema ku Nîgarkêş, ez û tu tê de leheng bûn çû. Niha lehengek tenê li ezmên û li ser zemîn heye, ew jî mirov e.

Mendîn: Eynî min tim nifir li te dikir, zarokên xwe berdewam perwerde dikirin ku bi ro û şev nifiran li te bikin, lê xuya ye rêçikên pêvejo ye me gihandin hevdu.

Mizawir: Hêêê Mendîno.., em hîro perîşan in, tiştek ji dest me dernakeve.

Mendîn: Tu çi dibêjî, were em bi hev re herin cem Nîgarkêş, belkî ew çareseriyekê li vê bêtarê bike?

Mizawir: Ew naxwaze kesekî bibîne û tiştekî bibihîse. Vê dema dawiyê min guhê xwe dida ezmên, min dibihîst xizmetkarên wî bi hev re dibîjin Nîgarkêş naxwaze heta wan bibîne. De wê çawa min û te pêşwazî bike?

Mendîn: Tu dibêjî wî roja xwe ya qiyametê berda û mirovan dadgeh nake?

Mizawir: Ku dadgehek hebe dê gelek zehmet be. Zarokên te bê edeb in, dê bi Nîgarkêş re di gengeşiyeke ji ya min û wî dijwartir kevin.

Mendîn: Tu dibêjî her tişt ji dest Nîgarkêş derket?

Mizawir: (Bi xemgînî serê xwe dihwjîne) Belê..belê. her tişt ji dest wî derket.

Mendîn: Law tu çiqas min ditirsînî, ez amade me bi Nîgarkêş re dijî zarokên xwe derkevim.

Mizawir: Dîno ma min ji te re negot ku zarokên te, tu ji sewdanê xwe derxistine. Ew ne hesabê te dikin, ne yê min û ne yê Nîgarkêş.

Mendîn: Ew çiqas nankor bûne, çeya Nîgarkêş ku ew aferandin înkar kirine.

Mizawir: Belê ew niha weha ne.

Mendîn: Ez dixwazim herim cem Nîgarkêş, ez dikim jê fêm bikin, çima zarokên min di vê rêçika şaş de çûn, û wî

tiştek nekir? Ji bo ku min fêkiyek xwar çi hanî serê min, çima niha bêçar ma ye? Meş ez û te bi hev re herin cem wî.

## Perde tê Girtin

## Beşa Heftem

(Li ser dîwarê şano cawekî hêşin e, çend stêrk li ser hene. Textê Nigarkêş li navenda şano ye. Li ser textê xwe nîv veketiye, Rûli tameşevanan ne. Odirê rûyê wî xuya dibe. Ketiye rewşeke mijûlgeriyê. Mizawir û Mendîn ji aliyekî şano tên cem. Her yek li aliyekî wî disekine û xwe li hember xar dikin).

Nîgarkêş: Ji min re sicdeyê mekin, ez êdî ne hewceyê sicdeyan im. Hun di ku re bûn dost ta bi hev re ne? De bêjin ji bo çi we xwest min bibînin?

Mendîn: Zarokên min ên şerxwaz em kirin dost. Vî (Nîşanî Mizawir dike) nifira te ji ser ranebe hinek nûçe dan min pê re gurzi ketin canê min. Ez nizanim ew rast dibêje lê dîsa hîlebaziyê li min dike ji bo careke din rûyê min li ber te reş bike?

Nîgarkêş: Çi ji te re got?

Mendîn: Ma çi negot Nîgarkêşê min,,! Dibêje ku zarokên min me hersiyan; Te, min, û Mizawir mirî dihesibînin, tew dibêjin em bi rastî tine bûn, em di endîşeyên wan de peyda bûn û di endîşeyên wan de jî niha batxûn bûn.

Nîgarkêş: (Nefeseke kûr dikişîne û berdide) Belê.. Mizawir rast dibêje.

Mizawir: Em herdu bi hev re hatin ji bo di vê bêtara tu tê de li aliyê te bisekinin.

Nîgarkêş: (Bi Mendîn re) Eynî ku di wan rojên despêkî de, ez pir ji we herduyan xeyîdîm, nemaze gava Mizawir li ber min derket û te jî tembeya min şikand. Min hun ji Bihuştê qewitandin, lê di van gotinên we yên niha de ez rêzdariyeke dilsoz di we de dibînim.

Mendîn: Nîgarkêşê Mezintirîn..ez dibînim tu ji me xemgîntirî. Çi hat serê te? Ma ti hêzek li dervayî te heye ku tu perîşankirî?

Nîgarkêş: Min dizanibû tiştên ku di wê roja kevar de Mizawir li ser te û zarokên te gotin rast in. Lê min bawer nedikir ku zarokên te di pêşerojan de dê sînorên min derbas bikin û perdeya xeyba min biçirînin, razên min giş aşkere bikin. Min gelek derfet dan zarokên te, xeyne ku derbasî xeyba min bibin. Lê li dawiyê derbas bûn.

Mizawir: Spas Nîgarkêşê min, li vê dawiyê tu min rast dibînî. Ma wê çzxê min bi te re negot ku toximê şer di pişta vî de ye (Nîşanî Mendîn dike), dê li ser

zemîn rewze bibe û li dawiyê dê were ber deriyê te. Çawa te nizanibû ku xêr bi sînor e, lê şer bêsînor e?

Nîgarkêş: Heta demeke dirêj rewş li ser zemîn di destê min de bû. (Çend duhmekan bêdeng dimîne) Paşê zarokên Mendîn li ber min derketin. Min qet bawer nedikir ku dê zarokên te (Li Mendîn dinihêre) wekî te fermanên min bişikînin; te li ezmên fermanê min şikand, wan jî li ser zemîn şikandin.

Mizawir: Nîgarkêşê min.. Ez dixwazim ji cenabê te re bibêjim, gava ez ji vî re (Nîşanî Mendîn dike) daneketim sicdeyê, tirseke mezin xwe girte ser dilê min, Ez hest bûm ku dê vaya bibe sedema bêtareke mezin. Lewra ez mecbûr bûm li ber te derkevim, belkî tu niyeta xwe biguhêrî û Mendîn ji pilana xwe derxînî. Lê te tim bi min re digot ê ez dizanim kes nizane. De ji xwe re li encama zanahiya xwe binihêre, te çi hanî serê xwe. Nîgarkêşiya te giş çû ber pûş.

Nîgarkêş: Mizawir di vê rewşa ez tê de dîsa destdirêjiyê meke. Ez naxwazim careke din nehletekê li te bikim, ji

ber ku tu jî li hember zarokên Mendîn êdî neçarî.

Mendîn: Hele tu ji hêlehopa xwe dûr keve looo..(Bi Mizawir re dibêje). Nîgarkêşê Mezintirîn..! Tê bîra min e, te got ku tuyê rêzanan bişînî nav zarokên min ji bo rêya te ya rast wenda nekin? Ka van rêzanan çi kirin?

Nîgarkêş: Belê min ji te re weha got û min sozê xwe bi cih anî. Serweriya min li ser zemîn berdewam bû. Hemû tişt di bin destê min de bû. Herku vî (Bi destekî xwe nîşana Mizawir dike) hewildida şer di nav zarokên te de gur bike, min rê li wî dibirî. Lê paşê..!

Mendîn: Paşê çi bû..?

Nîgarkêş: Xuya bû ku di vî gerdûnê min de ne bes aferîdeyên min çewtiyên xwe hene, belam ên min jî çêbûn. Kî dikeve sînorên vî gerdûnî, dê çewtiyên xwe hebin, çi aferîde be û çi aferîdêr be.

Mendîn: Çewtiyên te jî çêbûn..?

Nîgarkêş: Belê..belê..

Mendîn: Çewtiyên te ji ku derketin?

Nîgarkêş: Gava min rêzan Memo kir rêzanê dawiyê ev çewtiya min a mezin bû. Li pey wî demek dirêj derbas nebû

û zarokên te bi cinan ketin. Hun dizanin ez biryarê xwe ti carî naguhêrim. Min carekê gotibû ku piştî Memo ez ti rêzanan naşînim nav zarokên te, ji ber ku min texmin dikir dê Memo karibe bandora vî (Nîşanî Mizawir dike) bi sînor bike, wî di civata mirovan de bi carekê lawaz bike. Hîcar ji mêj ve min biryara girtibû ku piştî Memo ez jiyanê li ser zemîn dirêj nakim. Min roja Qiyametê amade dikir.

Mendîn: Êêê.. ma Memo ev nifirlêhatî lawaz nekir?

Nîgarkêş: Mendîn bese tu nifira ku min li Mizawir kir bînî bîra min. Derket ew tenê bi min re dilsoz bû. Heta di bin nifira min de ez înkar nekirim. Wekî min Mizawir ji hizûra xwe qewitand zarokên te jî ew ji nav xwe qewitandin. Wan ev kiryara ne bi alîkariya min û Memo kirin.

Mendîn: Lê bi alîkariya kê?

Nîgarkêş: Gava wan perde ji ser raza xeyba min rakirin ew gihîştin rastiyeke din.

Mizawir: Te dî (Mizawir bi Nîgarkêş re dibêje) çawa gotinên min giş rast derketin?

Nîgarkêş: Mizawir bes e, min aciz meke. Hun dizanin ku piştî min ev

gerdûna û tiştên tê de aferandin û li ser vê kulîna xwe rûniştim ji bo vês kim, min ti vêsî nedî. Bi ro û şev zarokên te (Nîzanî Mendîn dike) bala min dikişandin. Bi hezaran daxwaz ji min dikirin. Di navbera ezmên û zemîn de xeyne nameyên wan tiştekî din xuya dibû,

Mendîn: Nîgarkêşê min, çima tu niha min zindî nakî û wek rêzanekî naşînî nav zarokên min? Ezê wan vegerînim û li fêza te mexel bikim.

Mizawir: Ha..ha.. çi ji xwe bawer e. Dîno min ji te re negot ku wan ez, te û Nîgarkêşê ji sewdanê xwe çekirine. Ew tenaziyên xwe niha bi me dikin. Ku tu herî nav zarokên xwe, dê te wekî entîkekê di mûzeyekê kin, û xelke were li te temaşe bike.

Nîgarkêş: Min digot qey raperîna te (Li Mizawir dinihêre) li hember min kifreke mezin e û gunehê Mendîn ku ji wê darê xwar tiştekî ez nikanim qebûl bikim. Lê zarokên te (Nîşanî Mendîn dike) ne bes niha baweriyê bi min nakin, belam hebûna min înkar dikin. Min qet bawer nedikir, ezê ku ne kes despêka min dizane û ne dawiya min, dê di sewdanê mirovên ku qasî

spîyekê ne di gerdûnê min de, dê rojekê min bi sînor bikin, bandora min a li ser xwe pûç bikin.

Mizawir: Nîgarkêşê min, çima weke ku te li miletê Lût kir tu li wan jî nakî ? De Xişmo bişîne ser wan, bira zemîn rake û tevî wan serûbin bike.

Nîgarkêş: Hun ta niha pêşketina di sewdanê mirovan de derketîye fêm nakin. Berê ez di sewdan û dilê wan de tirseke mezin bûm. Piştî ku wan ez ji sewdan û dilê xwe derxistim, êdî serweriya min li ser wan nema. Ma Xişmo bê hêza min çi kane bike?.

Mizawir: Eynî ku ev rewşa nû min ji dojeha te rizgar dike û ji vê dawiyê kêfxweş im, lê tuyê zarokên Mendîn weha bihêlînî. Nîgarkêşê min ma pêvejoya jiyanê dê gor wan berdewam bibe?

Nîgarkêş: Gava min Mendîn afirand, raza jiyanê di dest min tenê de bû. Lê li vê dawiyê zarokên Mendîn gihîştin wê razê, lewra hêza min êdî nîne ku ez jiyanê bi dawî bikim.Jiyan ji dest min derket û hefsarê wê kete destê zarokên vî (Bi destekî xwe nîşana Mendên dike).

Mendîn: Ev çi tengasiyeke dijwar e hatiye pêş te Nîgarkêşê min..! Rewşa te hîro ji ya me herduyan dijwartir e.

Nîgarkêş: Min ew dara bihuştê li te û Jiyanê (Nîşanî Mendîn dike) kedexe kir ji ber ku min raza zanahiyê kiribû wê darê. Eynî li te û Jiyanê zanahî pir diyar nebû, lê di zarokên we de çilok da. Hîro hemû zanahî ji dest min derket û kete dest wan. Wan razên min ên li ezmên û yên li ser zemîn yek bi yek ji paş perdeya xeyba min derxistin.

Mizawir: Qasku te ji me re digot zanyarê ku kes nagihêje zanahîya wî ez im.

Nîgarkêş: Jiyana li ser zemîn zananahiya min derbaskir û bi aliyekî din de çû. Li vê dawiyê min bihîst mirov dibêjin ku ez beşek ji kelepora wan ya kevnar im. Ango ez ne zindî me. Ew vê keleporê wekî dîrokeke kevnar di dibistanan de ji şagirtan re dixwînin. De wê ev şagirtana çawa bi min bawer bikin.

Mendîn: Nîgarkêşê min..! Ma ew wiqas jîr bûne?

Nîgarkêş: Xaziya wê çaxê min guh bida xizmetkarên xwe û tu ne aferandiyayî. Çendîn ez wê çaxê kêfxweş bûm ku min tu aferandî, ez

niha jî pir poşman in û gelek xemgîn im ku min tu aferandî. Min qet bawer nedikir ku sînorên min li ser zanahiyê danîn dê mirov kanibin wan sînoran hilweşînin û di ezmên de min zindan bikin. Hîro ez li ser vê kulînê sirgûnkirî me. A kê ez sirgûn kirim? Zarokên te Mendîno.

Mendîn: Berî ku ev bêtara hîn mezintir nibe, gerek tu tiştekî bikî Nîgarkêşê me?

Nîgarkêş: Gava şer û xêr di dest min de bû serweriya min li ser zarokên te bê sînor bû. Lê gava bû parçeyek ji jiyana wan, ez jibîr bûm. Lewra ti bandora min êdî li ser mirovan nîn e. Ez nikanim dawiyê li jiyanê bînim. Hîro li ser zemîn şer û xêr bi hev re dimeşin û mirov tenê serweriyê li wan dikin.

Mizawir: Nîgarkêşê Mezitirîn..! ti carî min tu weha bêçare nedî.

Nîgarkêş: Ez poşman im ku ji bêxûtiya xwe derketim û ev gerdûna aferand. Ez ê careke din vegerim wê bêxûtiya xwe ya ezelî, serê xwe dînim û sermedî rakevim. Li pey min mirov çi dikin bira bikin. Êdî xêr û şer li ser zemîn bi hevdu re zewicin.

**Perde tê Girtin**

# Beşa Heştem

(Li ser dîwarê şano wêneya berê ya beyabanê û gora Mendîn e. Mendîn li ber gora xwe sekiniye, Mizawir jî xwe daye ser gopalê xwe û xûz sekinî ye. Her yekî berî xwe daye aliyekî û ketine mijûlgeriyê).

Mendîn: (Bêku li Mizawir binihêre) Evçi dawiyeke giran e..! Kê bawer dikir ku emê bigihêjin vê bêhêvîtiya xemgîn. Cihana ku Nîgarkêş ji xwe re avakir niha ne ya wî ye, zarokên min jî ne yê min in. Dibe ku te tenê ji vê dawiyê sûd girt Mizawero..! Nîgarkêş dev ji te berda. Tu bi agirê dojehê Eşkence nabî.

Mizawir: Belê..ji aliyekî de tu rast dibêjî. Ez ji wê dawiya ku jê ditirsiyam xelas  bûm. Lê ji aliyê din ve ez bi vê dawiyê zêdetirîn xemgîn im. Ev dawiya ji êşkenceya êgir girantir e. Çindîn ku Nîgarkêş sond xwar dê min  di êgir de abedîn biqewirîne, lê ti carî hêviya xelasê ji dilê min derneket. Min texmîn dikir ku li dawiyê dê dilê wî bi min bişewite û min efû bike. Ji berku min bi zanebûn û  bêzanebûn daxwazên wî yên ji mirovan vedişart bicih dihanîn. Erê wî nifira xwe li min kir, lê dîsa ez kêfxweş bûm ku di dirêjiya vê cihanê de hewceyê min bû. Û di nifira xwe de alîkarî ji min dixwast. Wî dixwest zemîn şên bike, ku min tu ji bihuştê dernexistiyayî, dê çawa zemîn şên bibûya?

Dawiya me hîro "Neyîn" e Mendîno.. ! Tu zanî neyîn çi ye ? Ew kortariya ku ti korahî jê tarîtir nîne. Tiştek tê de tine ye. Valahiyeke kor e.

Mendîn: Bêguman tu ji min û ji xizmetkarên Nîgarkêş zanatirî, tu ji me hemûyan wî kûr nas dikî. De were em vegerin despêkê. Gava Nîgarkêş tu ji hizûra xwe qewitandî û ez jî ji bihuştê derxistim. Min û te wê çaxê jê pirsî çima tu li me weha dikî? Nîgarkêş bi me re got: Ez dizanim çi dikim a hun nizanin. Ez dixwazim niha ji te bipirsim, ev dawiya ku em hersê gihîştinê, ev neyîna ku li ber deriyê min û te, di wê zanahiya Nîgarkêş de hebû? Pênûsê di deftera wî de nivîsî?

Mizawir: Bi rastî ez nizanim. Piştî me hîro li Nîgarkêş guhdar kir hemû tişt di sewdanê min de lehevketin. Hêza ku wî bixwe kire pişta te, bi demê re li ser zemîn ji nav pêçiyên wî filitî. Hêza wî li ezmên wekî xwe ma, a ya di zarokê te de li ser zemîn kete bin bandora zagonên sirûştiyê. Nîgarkêş carekê hêza xwe bikaranî, gerdûna û em aferandin. lê zarokên te hêza xwe berdewam bi bikaranin, lewra hêza wan mezin bû û ya Nîgarkêş derbas kir.

Mendîn: (Bi matmayî lê nihêre) Min ji te fêm nekir, hele gor sewdanê min şîrove bikî?

Mizawir: Me bawer dikir ku Nîgarkêş gizorî û

absolût e. Zarokên te dibêjin hemû zanahiya gizorî û absolût nakeve bin bandora guhartin û pêşketinê. A zanahiya rêjeyî berdewam zêde dibe. Lewra zanahiya zarokên te di bin bandora guhartin û pêşketinê de zanahiya Nîgarkêş derbas kir. Mendîno.. ! derket hemû tiştî gizorî û absolût miriye û hemû tiştê rejeyî zindî ye.

Mendîn: Dêmeg zagonên zemîn ne wekî yên ezmên in? Di zanahiya zarokên min de tiştekî gizorî û absolût nîn e. lewra berdewam zêde dibe. Weha ti dixwazî bibêjî ?

Mizawir: Weha xuya bû. Zagonên li ser zemîn ne wekî zagonên li ezmên in. Ez ta niha bi zarokên te re dijiyam, di sewdanê wan de digeriyam. Wan roj bi roj zanahiyên nû werdigirtin. Gava tu wekî Nîgarkêş dibêjî ez zanim deriyê zanahiyê li pêş te kilît dibe. Lê gava tu dibêjî ez nizanim, ev gotina hemû deriyên zanahiyê ji te re vedikin. Li Nîgarkêş jî weha bû. Tim digot ez ê dizane ne hun. A binihêre li dawiyê çi hat serê wî?

Mendîn: Tu dixwazî bibêjî zanahiya zarokên min ji yê Nîgarkêş pirtir û zêdetir bû û êdî ne hewceyê ti Nîgarkêşan in?

Mizawir: Ez vê yekê bi temamî nizanim, lê çendîn ez bi Nîgarkêş re demeke dirêj berî te jiyam û paşê bi zarokên te re ta niha dijîm, ez kanim bibêjim hêza Nîgarkêş bi yekîtiya wî de girêda ye, a ya

zorokên te bi piraniya wan de girêda ye. Li despêka cihanê ez, tu û çend xizmetkarên Nîgarkêş hebûn. Em girupeke biçûk bûn di sînora desthilatdarîya wî de. Lê niha zemîn bi zarokên te mişt bûye. Wan desthilatdariya xwe ava kirine.

Mendîn: Berî ez ji bîr bikim (Eniya xwe mist dide), dixwazim tiştekî din ji te bipirsim.

Mizawir: Hîcar çi dixwazî ?

Mendîn: Madele pilana Nîgarkêş ji bin de hilweşiya, bi nêrîna te pêşeroja zarokên min kuda diçe? Mebesta min çi ji te ve xuya dibiye?

Mizawir: (Mizawir jî aniya xwe mest dide) Bi rastî zanebûna min ji zanebûna Nîgarkêş e. Madele ew li hember zanahiya zarokên te pertîşan e û mecbûr bû vegere bêxutiya xwe, tiştek êdî li ber çavên min xuya nabe. Min ji zarokên te dibihîst ku ev cihana sermedî ye. Ne quyamet heye û ne cihaneke din.

Mendîn: Ango weha ta sermedê dê mirov zayîn bibin û bimirin, lê ademîzadî dê berdewam bibe.

Mizawir: Ez kanim bibêjim ku ew jî (destê xwe bi jor de radike nîşanî Nîgarkêş dike) niha nizane. Zagonên zemîn serbixwe ne. ne tiştek û ne kesek ji derva de kane bandore li van zagonan bikje. Ku guhartinek di van zagonan de derkeve, dê ev cihana ji bin de were guhartin.

Mendîn: (Bi matmayî û rêzdarî li Mizawir dinihêre) Ma te ev zanahiya ji berê de dizanibû?

Mizawir: Na.. min nizanibû. Lê min pir zanahî ji zarokên te wergirt.

Mendîn: Dêmek tu giştî baweriyê ku bê sûd bû gava di civîna Pelemana Nîgarkêş de te xwe ser min re girt. A tu niha dibêjî ku li ser zemîn tu bûyî şagirtê zarokê min.

Mizawir: Ji te be wê çaxê, li civîna ezmên ez ji te hasûd bûm, lewra ji te re daneketim sicdeyê? Na..na Mendîno..! A ji berku Nîgarkêş ez daxistim asta xizmetkarên xwe yên din e gêjok. Ew xuzmetkarên ku xweyne sicdeyê tiştek nizanin. A duyem, min di cida texmîn kir ku guhartinek di Nîgarkêş de peyda bû. Ev guhartina dê bibe sedema tracidiyeke mezin. Min di aferandina te de tiştekî cuda dî. Ez gihîştim baweriyekê ku Nîgarkêş dixwaze şer di vî gerdûnî xwe de biçîne. Çi hat serê wî ez nizanim?

Mendîn: Qasko tu ji me gişkan wî nas dikî, berî me bi wîra bûyî û tu dibêjî ku tu aferîdeyê tewrî nêzike wî bûyî.

Mizawir: Belê ez weha bûm û lewra li ber guhartina wî derketim. Ti carî nedahat bala min ku dê rojek wer ezê li ber wî derkevim. Ez li ber aferandina şer derketim. Ew şerê ku tu niha bi xwe dibînî çawa em gihandin vê rewşê. Ez ji te bihtir bi şer tewanbar bûm, ji xizmetkarên wî bihtir û ji zarokên te bihtir. Lê kesekî ez

fêm nekirim. Heta ku mirovek kiryarekî pîs dike di cida dibêje: Nelet li çavê Mizawer were, ez xapandin. Gelo ma min ew xapand? Na…na Mendîno..! Şerê ku Nîgarkêş bi hevîrê te re mist dasedema karyarên mirov yên pîs in. Ez hîro pir xemgîn im ku di wê civîna ezmanî de kesek tevlî raperîna min nebû û nifira wî li ser milê min tenê ket.

Mendîn: Min ta niha nizanibû ku tu viqas dîndarê Nîgarkêşî û ramyarekî kûr diramî. (Serî xwe bi aliyekî de dike û wekî ku li dûr dinihêre) Bêguman ez pir bextewer bûm gava Nîgarkêş ez aferandim, ez bi gewdeyê xwe şad bûm, bi hiş û hestên xwe bextewer bûm. Ez bi şehweta di hundirî xwe de keliyam. Wê çaxê ji min be ez zindiyekî di gerdûnê wî de yê tewrî bedew û hêjam e. Lê niha, ew bexteweriya min li ber çavên min wekî xewnekê vemirî. Belam baweriyek bi min re çêdibe ku şerê Nîgarkêş di min de çand çewtiya wî ya tere mezin bû.

Mizawir: (Li dûr dinihêre û bi gotinê Mendîn re serê xwe dihejîne) Her aferîdek li dawiya bûyerê hişmend dibe..

Mendîn: Mizawir..ez texmîn dikim ku
gotinên me êdî bê wate ne.
Ezê li vê dawiyê çeyakê bi te bikim.
Çendîn li despêkê em dijminê
hevdu bûn, lê vê dawiyê em
kinin çarenûseke hevbeş. Tu dibînî

gora min li min fereh e, ew têre min û te dike. Qasî ku min fêm kir ciyê te jî li ti waran nema. Were em bi hevdu re di vê gorê kevin. Axê bi ser xwe de hilweşînin. Piştî ku Nîgarkêş kete bêxûtiya xwe, tiştekî me jî ne li vê cihanê û ne li wê cihanê ma.

(Hêdî hêdî tarîtî xwe digire ser wan, heta ji ber çavan wenda dibin).

**Perde tê Girtin**